

Kaj Falkman

Heştewaney dîplomasî

Heştewaney dîplomasî birîtîye le heşt gutar, dîplomatî swêdîy nawdar Kaj Falkman le dû kitêbî ciyawazda nûsîwnî:

kitêbî yekem: *“Turkiya - mîrî hawsê – çend dîmenêk le koşkî swêdîy Îstenbûlewe”*.

Kaj Falkman. *Turkiet - Gränsfursten: utsikter från Svenska palatset i Istanbul*. Atlantis 1999.

Nûser le nêwan 1990-1995 serkonsulî Swêd bûwe le Îstenbûl. Yekser paş kotabûnî ew maweye, Falkman em kitêbey nûsîwetewe. Belam salî 1999 ewca pexş kirawe. Lem kitêbeyan dû gutar wergîrawe:

- 1) Kurd - “bo tîrê qeza kirine armanc” - *Kurderna - “mål för ödets pilar”*.
- 2) Dozî Mûsil û “wam” -ekey Swêd - *Mosulfrågan och den svenska “skulden”*.

Kitêbî dûhem: *Erk û serçilî: yadewerîy dîplomasyane*.

Kaj Falkman. *Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati*. Carlsson 2008.

Şeş gutarî lê wergîrawe:

- 3) Terceme û lêkdanewe - *Tolka och översätta*.
- 4) Hemekar û taybetkar - *Generalister och specialister*.
- 5) Siyaset û layenî mirovkar - *Politik och det mänskliga*.
- 6) Serok û rêberayetî - *Chef och ledarskap*.
- 7) Peyv û ziman - *Ord och spårk*.
- 8) Kamen xesletî dîplomatî baş? - *Vad kännetecknar en god diplomat?*

Nûser: Kaj Falkman

Nawî kitêb: *Heştewaney dîplomasî*

Tercemey le swêdîyewe: Asos Şefîq. Suleymanî, Kurdistan 2012.

Kaj Falkman. *Turkiet - Gränsfursten: utsikter från Svenska palatset i Istanbul*. Atlantis 1999

Kaj Falkman. *Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati*. Carlsson 2008.

Översättning till kurdiska: Asos Shafeek

Suleymanî, Kurdistan 2012

Têbînî: hemû perawêzekan zadey em terceme kurdîyen.

Em berheme be elfbêy aramî:

https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/Heshtewaney_Diplomasi.pdf

Pêrist

Kurd - “bo tîrê qeza kirine armanc”	4
Dozî Mûsil û “wam” -ekey Swêd.....	25
Terceme û lêkdanewe	29
Hemekar û taybetkar.....	31
Siyaset û layenî mirovkar.....	33
Serok û rêberayetî.....	38
Peyv û ziman.....	42
Kamen xesletî dîplomatî baş?.....	47

Gutarî yekem

Kurd - “bo tîrê qeza kirine armanc”¹

Kurd - “bo tîrê qeza kirine armanc”

Le pêdeştêkî nêzîk Edene dîman reşimal heldirawe, jinan le nêwan çadirekanda xerîkî şordinin û mindalan le ber xorî pêşinîweroda wazî deken. Yeşar kemal -î be reçekek kurd, gutî: “emane werzekirêkarî kurdin” û rûnî kirdewe “hemû hawînêk kurd bo harîkarîyî dirwêne le çiya dêne xwar”. Ême le otobusda bûyn berew gundî Çukurova le başûrî xorhelatî Turkiye,² berew zêdî mindalîyî Yeşar Kemal. Ême û çend nûserêkî dost banghêşt kirabûyn bo beşdarî le aheng bo rûhelimalînî peykirêkî nûser le gundekey xoy.

Eme yekem car bû ême em core reşimale y bizinemû bibînîn ke zor car bedem basî kurdewe dête pêş.

Beserhatî efserêkî pirûsî

Supasalarî pirûsî Helmuth von Moltke (1800-1891) le mêje reşimalekanî şaxelanî Kurdistanî nêwan Dicle û Furat (Firat) -î beser kirdotewe. Moltke her be lawî, salî 1835 wek efserî fermandey giştî le layen qeyser Friedrich Wilhelm III³ be mebestî harîkarîyî sultan bo rêkxistin û rahênanî erteşeky be şêwazî ewrûpî, nêrdiraye Îstenbûl. Moltke çîwar sal lewê mayewe û namey bîrewerîyekanî xoy “*Unter dem Halbmond*” - “*Le sayey newmangda*”⁴ tomar kirdûwe.

Le nêwan beharî 1838 û hawînî 1839 da Moltke beşdarî hêrişêkî turkî bû dij be kurdî yaxî le nawçey nêwan dû dewletî Usmanî û fars. Le dolêkî nêw çiyada leşkirekey em tûşî reşimalî kurdan debin:

Axa le gewretirîn reşimalda pêşwazî le mîwan dekat, pîrepiyawêke be ridênêkî maşubirincî ciwanewe. Çadireke be teyman⁵ kirawete çend hobeyek têyda mîwan, jinan, esp, huştir, manga û bizin şwênî terxanî xoyan heye. Agirêkî gewre le nêwendda bilêsey dêt. Axa dawetî nan, şîr, hengwîn û penîrim dekat. Xoy ne dexwat û ne dexwatewe heta min daway lê nekem. Em axaye fermanî beser 600 xêzanda rewaye. Fermanîşî nagerêtewe. Ger belgey tawan aşkîra bêt, paş rawêj be pîranî xêl, em boy

¹ Serçawe: Kaj Falkman. Kurderna - “Mål för ödets pilar”.

Turkiet - Gränsfursten: utsikter från Svenska palatset i Istanbul. Atlantis 1999.

² Serleberî çemik û derbirînî nêw em nûsîne berhemî nûser û kitêbekey nûserin, bo nimûne ger nûsira “bakûrî Kurdistan” yan gutira “başûrî xorhelatî turkiya”, herdûk her derbirînî nûserin û le rûy dîplomasî û siyasîyewe wata û sengî xoyan heye leber ewe wek xoyan, bê destkarî kirawinete kurdî. Herçî perawêze, zadey em terceme kurdîyen.

³ Friedrich Wilhelm III (1770-1840) le nêwan 1797-1840 da qeyserî Pirûsya bû.

⁴ Newmang: mangî demedas, hîlal.

⁵ Teyman: perjînî zel û qamîş.

heye fermanî merg beser endamêkî xêlekeda bisepênêt. Deselatî turkî beparêze le dest xistine karûbarî nêwxoy kurdewe. Cênşînî axa hemîşe le nêw heman xêzanda dête helbijardin.

Moltke, swarîy dijwar be hewrazî çiya û be rûbar û çemî serşêtda, le dîmenî zor zîndûda pêşan dedat. Wiçanî nêw gulzarî beharemêrg û gizîngî xor beser çiyay befirînewe lay Moltke debine nîgarî helbestamêz. Agir hemîşe berbeste le serma, belam le deştî rûtenî ber hawînexorda, xo parastin le 40 pile germa, asan nîye. Moltke tûşî kurd dêt, hem dost û hem neyar.

Helmuth von Moltke zor car rexnegirane beranber biryar û reftarî efsere turkekan dête go. Bêhude hewil dedat rê bigirêt le sûtandinî gund û xermanî kurdekan:

Hêrişî turkekan jiyani hezaran kesî kujandewe, jiyani nek tenê çekdar bigire jin û mindalî bêderetaniş, hezaran gund û kêlgey wêran kird û rencî çendîn salî fewtand. Mirov xem day degirêt lewey emane [turk] wek zor carî pêşûtir dagîrkerî katekîn, le paş xoyan fermanarîyek cê nahêlin baştir bêt lew xofermanîyey kurd xoy heyetî.

Kurd herdem le jêr pestanî derwasê behêztirekanî xoyda bûwe, fars, ereb û turk. Emane kurdyan wek qelxan bekar hênawe bo xo parastin le hêrişî yektir. Xêlekanî kurd le hewilî berdewamda bo ragirtinî hawsengîy nêwan xwastî serferazîy xoyan le layek û ew merc û destkewtaney debête berhemî selimandinî deselatî hêzî beranber le layekî dîkewe, carêk piştîwanî em deselate bûn û carêkî dîke ewla.

Fermanarîy fars ziyadtir berhest bûwe le hî turkan, leber ewey şare gewrekanî Tewrêz, Esfehan û Taran tenha çend rojêkî swarerê le Kurdistan -ewe dûr bûn, herçî Îstenbûle çendîn hefte swarerê dûre. Leber eweye turk naçar bûn ziyadtir pena berne ber fermanarî le rêy serxêl û serhozî nawçeke nek fermanarî rastewxo. Emeyiş azadîyekî firewantirî da be kurdî jêr rikêfî Usmanî be berawird legel dîwî deselatî farsda, leber eweyişe serxêlekan zor car pêyan baştir bû be ferimî serbe sultan bin. Beranber eweş deba eman le katî pêwîstda piyaw û esp bidene leşkirî usmanî.

Şarî Nizip⁶ dekewête nêzîk gundî mindalîy Yeşar Kemal -ewe, lewdîw çiyay Toros-ewe, pena sinûrî Sûrya. Lewê bû Helmuth von Moltke beşdarî hêrişêkî gewre bû dij be leşkirî mîsirî be fermanarîy Îbrahîm paşa. Mîsirîyekan deyanwîst xoyan le dest dewletî Usmanî rizgar biken û leşkirêkî 45 hezar kesîyan saz da bo pelamardanî turk. Leşkirî sultan cengawerî ziyadtir bû, nêzîkey 70 hezar kesî hebû, belam be topxaney lawaztir. Wirey cengawerane le herdû la kiz bû, serbaz û efserêkî zor heldehatin.

Ewey Moltke y zor herasan dekat, serbazgîrîy bezorî kurd bû. Katêk jimarey leşkir, be hoy nexoşî, merg û helatinewe dehate nîwe, turk bo leşkirgîrî rûyan dekirde gundî kurdnîşîn. Danîştwan le gundekanî xoyan heldehatin, be seg raw dekiran, newcewan, zor car mindal degîran, pet dekiran û derfêniran.

Tenanet ke serbazîş bûn emane her wek zîndanî reftaryan legel dekira, zimanî fermandekan tenegegeyiştin. Şewanî weha hebû 50 kes be esp û çekewe le berey ceng heldehat. Hîç kurdêk, tenanet xorakî baş û poşakî gerimîşî bidiraye, le dû sal ziyadtir le leşkirda nedema. Dehate nexoşxane, yan demird yan xoy derbaz dekirde.

⁶ Belqîs - î ser be ustanî "Dîlok" (Xazîentab) -î Turkiyey em rojgareye.

Leşkirî mîsirî le nakaw arastey gorî, goya paşekîşe dekat, belam Moltke deyzanî eme firîwe be nyazî pelamardanî tenîştar.⁷ Leber ewe Moltke amojgarîy fermande turkekey kird ferman bidat be paşekîşe bo sengerêkî baştir û emîntir lew nêzikane. Belam fermandey leşkir neyselimand, nek her leber ewey paşekîşe karêkî şermezaraneye û sultan zîz dekat, bigire leweş bitirazêt, leber ewey bawerî hênde kiz bû be leşkirekey xoy, deyzanî hemû paşekîşeyek debête mayey rûxanî wire.

Herdûkiyan başî boçûbûn: katêk hêriş le tenîştarewe hat, leşkir peşoka û her yek be layekda helat:

Legel destpêkî paşekîşeda, hemû şîrazeyek helweşayewe. Kurdekan – ke ziyadtir le nîwey leşkirî emeyan pêk dehêna – bûne dujminî xoman. Efser û serbazekanî xoyan daye ber gulle, rêçke şaxawîyekanyan dagîr kird û çend carêk pelamarî fermandekanî xoyan da. Beşêkî dîkeyan çekiyar firê da, poşakî serbazîyan firê da, bedem sitrançirînewe be şadîyewe rêy gundekanî xoyan girte ber.

Turk şika. Belam heta demew kotay cengî yekemî cîhanîy xayand ewca dewletî Usmanî rima û dewletanî serkewtû, Brîtanya û Franse dewletanî niwêy Îraq û Sûrya -yan damezirand. Çi Kurdistan - êk nehate damezirandin, belkû kurd le nêwan çiwir dewletda dabeş kiran: Turkiye, Êran, Îraq û Sûrya. Ew sinûraney heta ew deme hemîşe kirçukal bûn, ewca bûne kospî cêgîr û rêbest le geranî azadaney mêgelî kurdan bedûway lewergey başda.

Erê Kurdistanêkî azad bo nehate damezirandin?

“Kilîl sinûran”⁸

Nawî Kurdistan wek pênaseyekî ciyografî le sedey dûwazdeda le layen selcûqanewe hatûwe, belam dûr nîye lay kurd xoy zor lewe dêrîntir bêt. Efsanekanî kurd delên ewetey heye em xake nişîmenî xoyan bûwe. Efsaney hemecor heye derbarey rîşey kurd: newey ew mindalgelen le dest Zuhakî dêwî dilxor, helatin bo çiya, newey kenîzekanî şa Suleyman -in, yan newey Sara kurdey hawserî Îbrahîm-in. Le gişt efsanekanda şa û dêwî tirsinak em mîlletey rûwew çiya raw nawe. Helbete efsaney weha rengdanekey ezimûnî kurdewariye, herdem dewrediraw bûn be şa û xanî behêzî fars, ereb û turk.

Hem efsane û hem mêjû noreyekî girîngiyar heye bo dirustkirdinî hoşî hawko. Ehmedî Xanî le honraweyekî demew kotay sedey hevdeyemda, be nawî “*Mem û Zîn*” delêt kurd le gişt layekewe be mîlletanî biyanî dewrey dirawe û bedestyanekey bûwete “*armancî tîr*”:

*Ev rom û ecem bi wan hesarin
Kurmanc hemî li çar kinarin!*

*Herdû terefan qebîlê kurmanc
Bo tîrê qeza kirine armanc*

⁷ Tenîştar: latenîştî bas yan babetêk. “Pêşar û piştari leşkir” bo beşî pêşewe û beşî piştewey leşkire. Serçawe: Celizade M.M. “Zarawesazîyê pêwane”: www.mamosta.net.

⁸ Em destewajeye amajeye be ragiwastekey Xanî le Mem û Zînda ke delêt: “Goya ku I ser heddan kilîdin” - ke dekatewe “heres hdûd” -î em serdeme!

*Goya ku li ser heddan kilîdin
Her taîfe seddekin sedîdin*

*Ev qulzumê rom û behrê tacîk
Hindî ku bikin xirûc û tehrîk*

*Kurmanc dibin bi xûn mulettex
Wan jêkfe dikin mîsalê berzex!⁹*

Belam kurdîş le nêw xoyda be çiyay beriz û serxêlî deselatdar leyek tirazabûn. Ewey koy dekirdinewe ziman bû, belam zimanîş dabeş bûbû beser çend zaraweyekda, her yek le dolêk. Le kurdîda dû ziman, yan zarawey gewre heye, kurmancî û soranî, le rêzimana hêndey inglîzî le almanî ciyawazin, le rûy wişedarîyewe hêndey holendî le inglîzîyewe dûrin. Zimanî kurdî zimanêkî hîndorûpî (hîndoewrûpî) ye boye tojeran delên kurd newey xêlanî hîndorûpîn û dû hezar salêk ber le zayîn le Êran -ewe berew xorawa rewyar kirdûwe. Zimanekeyan legel farsî xizme û hîç peywendîyekî be turkîyewe nîye ke serbe zimangêlî *altayî* (*altaic*) ye. Turk zor direngtir hatine Anatolya, her emeşe kurd deyKate belge bo xawendaretîy ew xakey lêy niştêcên.

Herweha le rûy dînîşewe çendîn ciyawazî heye. Gerçî zurbey kurdîş wek turk musulmanî suninen, belam eman serbe ayîn (mezheb) -î şafî-in nek heneffî. Kemîneyek le nêw kurdda şîe-n, beşêkiyan wek êranîyekan şîen, beşêkiyan hawşêwey turk, elewîn. Sufîgerî û bawerî ber le îslam, wek şamanîzim û zerdeştî rîşeyan le hizirî dînî kurdda qûle.

Hoşî millî

Sedey nozdeyem cengî azadîy dij be dewletî Usmanî helgîrsa û bêguman karîgerîy Leser kurdîş dana. Katêk yonanî, serbî û ermen kewtine koşêş bo serwerîy millî Leser binaxey peywestî etnî,¹⁰ kurdîş hoşî pija be peywestî etnî xoy û derfetî siyasîy xoy. Desteyek xebatyan bo serwerîy rehay siyasî dekird, desteyekî dîke daway xofermanî (otonomî) yan dekird le çêweyekî firewantirî îslamî û sayey xelîfeda. Kurd, be mebestî dozînewey çareser le çêwey dewletî Usmanîda, beşdarî bizave rêformxwazekanî kotay sedey nozdeyem û seretay sedey bîstem bûn. Salî 1898 govarî "*Kurdistan*" be dû zimanî kurmancî û turkî pexş kira, sereta le Qahîre û paşan le Jenêv (*Geneva*) û London.

Legel bizavî "turkî cewan"¹¹ -î seretay sedey bîstem, boçûnî sekular (îlimanî) ane seryan helda û paşan geşeyan kird û le zemanî Etaturkda tewaw piyade kiran. Bedem geşey azadîyewe derfet xoş bû bo çapkirdinî "*Kurdistan*" û rojnamey dîke le Îstenbûl û Diyarbekir.

⁹ Serçawey em têkste kurdîyey "*Mem û Zîn*": Elaeddîn Seccadî, "*Mêjûy Edebî Kurdî*", Bexda 1952. Em çend dêre berward kirawe be serçawey dîke boye ciyawazî heye legel serçawekeda. Her bo nimûne wişey "Rom" - yan "Rûm" - le serçawekeda be "Rum" hatûwe.

¹⁰ Etnî: Ethnic, nejadî, serbe nejad, bineçe û reçekek.

¹¹ Bizavî "turkî cewan" – "jön turkler" bizavêkî rêformîstane nasyonalîstane bû le kotay sedey nozdeyem û seretay sedey bîstem le dewletî Usmanîda serî helda. Bizavî "turkî cewan" be serokayetî "*cemîyetî îthad û tereqî*" (*komeley yekîyetî û pêşkewtin*) bo sepandinî destûr û gorankarî le berêwebirdinî dewletda, dij be seletenetî reha û w deselatî sultan Ebdul Hemîd -î dûwem (1842-1918) (le nêwan 1876-1909 da sultan bû) karî dekird.

Her zû xerendêk kewte nêwan sertel (destbijêr, elît) -î azadîxwazî kurd le Îstenbûl le layek û axa û şêxekanî Kurdistan. Bîrokey rêformxwazane û ziyadbûnî deselatî nêwend le Îstenbûl hereşey le deselatî xocêyî eman dekird. Em xerende her ma û bûwe rêbestêkî girîng bo serbexoyî kurdî.

Trajêdiy ermenî

Dengoy xebatî azadîxwazaney kurd û ermen be parêzgarîy rûs, deselatî usmanî le Îstenbûl nîgiran kirdibû. Serokayetîy dewlet kewte xoy û çendîn şandî narde lay serxêlekan bo huşyarkirdineweyan le planî kafirekan (rûs û ermen) be mebestî dagîrkirdinî Kurdistan. Gerçî rûsîş hewilî da serxêlekanî kurd bekar bihênêt dij be turk belam siyasetêkî damezirawyan nebû dostekurd bêt, çunke rûs detirsa le tundbûnî nakokîy nêwan kurd û ermen Leser dozî serxobûn.

Cengî yekemî cîhanî bûwe hoy rahêzanî nakokî le nêwan herdû leşkirî turk û rûs, le nawçekanî kurd û ermenda. Paksazîy regezî le nakokîy salanî 1915-16 da bûwe diyardeyekî baw: turk û kurd kewtine kuştar û derperandinî ermen “be tometî xeyanet û casûsî”. Ewca ke leşkirî rûs xoy xizande Anatolya - we, ermen toleyan le kurd kirdewe. Katêk rûs be naçarî paşekîşey kird, 200 hezar ermen gundî xoyan cêhêşt û dûway leşkirî rûs kewtin. Kurd le erteşî usmanîda zorîne bûn û beşî zorî kuştarî ermen be destî kurd encam dira. Kurd bewe dakokî le xoy dekat ke naçar bûwe fermanber bêt, legel eweşda aşkiraye dîn karîgerîy gewrey hebûwe. Deste swarey serbestî kurdîş sûdyan lew barûdoxe bînî bo pelamardan û tolesandinewe.

Herweha turkîş sûdî lew helûmerce bînî bo rawnanî kurd û sûtandinî gundekanyan, biyanûy aşkira deygut berbestine le xoparêzî û xobjêwî rûsî dujmin. Mebestî penhan birtî bû le binkolkirdinî xebatî rizgarîxwazîy kurd.

Şorişî rûsîy oktoberî 1917 doxekey gorî. Leşkir felec ma û paşekîşey kird, belam turk û kurd hêrişyan bird û zewî dagîrkirawyan sendewe. Karwanî ceng bêqanûnî, birsêtî û xelk ragiwastinî bedemewe bû. Têkra nêzîkey yek milyon ermenî û 800 hezar kurd bûne qurbanîy şer û kuştar, nîweyan xelkî sîvil bûn.

Einar af Wirsén¹² le bîrewerîyekanîda, çapterêk naw denêt “*Kuştinî mîlletêk*” û bem wişane dest pê dekat: “*Yekem salî min le Turkiye trajêdiyekî mezin rûy da ke yekêke le rûdawe here tirsinakekani mêjûy cîhan. Mebestim darmanî ermene*”.

¹² Efser û dîplomati swêdî Einar af Wirsén (1875-1946) bîrewerîyekanî xoy derbarey ew deme le kitêbî “*Minnen från fred och krig*” - “*Yadaştekanî aşî û ceng*” - (Bonniers, 1942) tomar kirdûwe. Lem kitêbeda af Wirsén be wirdî karesatî kuştarî ermen bo mêjû tomar dekat. Cige lew çapterî lêreda nûser amajey pê dekat - “*Mordet på en nation*” - “*Kuştinî mîlletêk*” - em babete le çendîn cêy kitêbekeda beser dekirêtewe, her bo nimûne le laperey 131-132 da ragiwasteyekî taybet le Telet paşa degêrêtewe ke ew deme wezîrî nawxoy dewletî Usmanî bû. Af Wirsén delêt:

Ew [Telet paşa] bem core hate ser basî kuştarî ermen ke ew sale destî pêkirdibû: “debînim Times nûsîwyetî goya ême be gullebaran yan be şêwey dîke ziyadtir le 800 hezar ermeniman kuştûwe. Min dilnyatan dekem, em guteye naraste, ewe tenha 600 hezar bû”. Ew [Telet paşa] em pejrandine tirsinakey weha sakar degêrayewe, her detgut babetêkî tewaw rojane bas dekat.

Belam af Wirsén le çend cêyekî ew kitêbeda, nek her le basî kuştarî ermenda (lapere 226), belkû begiştî zibir û dirişt le mîlletî kurd dedûwêt. Her bo nimûne lapere 177-178.

Dîplomatekan le Îstenbûl heta hawînî 1915 ewca wirdekarîy ew ragiwastin û kuştareyan pê geyîşt. Balwêzî amerîkayî Morgenthau¹³ çendîn car be tundî fişarî hêna belam nakam, almanekanîşî bewe tawanbar kirdûwe ke beşdar bûn le helmetekanî ragiwastinda. Af Wirsén gerçî emeyan be ziyaderoyî dezanêt, delêt:

Belam naşêt almanekan le berpirsayetîy gewre reha bikeyn, çunke bo rêbestin lew kuştare destewestan bûn. Gerçî efsere almanekan çendîn hoşdarîyan daye hikûmetî Almanya û tenanet kesayetîyekî nawdarî wek Liman von Sanders¹⁴ -î supasalar pestanî behêzî xiste ser hem balwêzî almanî û hem hikûmetî turkî.

Jimareyekî zor le almanekan tewaw tûre bûn lew helwêste û tenanet af Wirsén -î etaşêy erteşî (*Military attaché*) çend efserekî almanîy denasî ke le cêy rûdaweke bûn û ew kuştareyan dîbû, katêk geranewe Îstenbûl bo derbirînî narezayî, xelat û nîşaney turkanyan ret kirdewe. Einar af Wirsén denûsêt:

Naşêt serleberî gelî turk tawanbar bikeyn bewey rûy da. Eman gelêkî xoş mak û sîngfirewanin û çî dirîyekîyan lê diyar nîye zêdetir bêt lewey le gelanî dîkey xorhelatda heye. Car hebûwe, danîştwanî turk tewaw xoburde hemû hewilî xoy dawe bo kemkirdinewey xemî tirsinakî ew xelke ragiwêzirawe. Tenanet walî hebûwe, bo nimûne Rhami Bey y walîy Smyrna (Îzimîr) ke kesayetîyekî zor serrast bû, fermanî hikûmetî neselimand be ragiwastinî xelk. Gişt ew tawane estoy hikûmetî "turkî cewan" û karmendekanî degirêtewe. Leşkir û jendirme bê hiç bîrkirdineweyek fermanyan cêbecê dekird. Belam danîştwanî kurdî bêferhengîş,¹⁵ ke be rêgirî dejîn, berpirsayetîy gewreyan le estoye lewey bew core tirsinake ragiwastinekanyan cêbecê dekird.

Ermen, betaybetî ermenî diyaspora (*diaspora*, henderan), em beserhateyan leyad nekirdûwe. Le Amerîka *Armenian-American communities* salane mangî aprîl (nîsan) yadî qurbanyan dekenewe û le salî 1970 ewe le herdû hobey kongresî amerîkayî, hem sênat û hem xaney niwêneran,¹⁶ yadî qurbanîyekan dekirêtewe. Salî 1979 xaney niwêneran beyanêkî hawbeş ("*Resolution*") -î rageyand:

Honoring the victims of the Armenian Genocide perpetrated by the governments of the Ottoman Empire from 1915 to 1923, prior to the establishment of the Republic of Turkey.

Af Wirsén le nêwan 1924-25 demrastî ew lîjneye bû ke "*Komkarî Welatan*" sazî kird derbarey dozî *wîlayetî Mûsil* (başûrî Kurdistan).

¹³ Henry Morgenthau (1856-1946) balyozî Amerîka lay dewletî Usmanî le Îstenbûl (1913-1916) yadaştî xoy derbarey koştari ermen lem kitêbeda tomar kirdûwe: *Ambassador Morgenthau's Story* (1918).

¹⁴ Liman von Sanders (1855-1929) ceneralêkî nawdarî ew demey almane, salanî 1913-14 serokî komîsyonî almanî bû bo rêxistinewey leşkirî turkî. Salî 1914 bûwe çawdêrî ew komîsyone. Salî 1915 leşkirî turkiye be serokayetîy Liman hêrşêkî gewrey "*Berey Hawpeymanan*" -î le Derdenîl şikand. Liman salî 1918 serokî leşkirî turkî - almanî bû le Sûrya û Felestîn.

¹⁵ af Wirsén rêk "*danîştwanî kurdî bêferheng*" - "*den ociviliserade kurdiska befolkningen*" bekar dehênêt. Deşkirêt wişey *ociviliserad* be "jîyarbeder", "kêwî", "naşaristan"... htd terceme bikirêt.

¹⁶ Kongresî amerîkayî birîtîye le dû hobe: "Sênat" - *Senate* - û "Xaney Niwêneran" - *House of Representatives*.

Herweha le welatî Fransa -yîş, grûpî pestanî ermenî paş lobîkarîyekî çir twanîyan parlemanî fransî razî biken mangî junîy salî 1998 beyanî hawbeş rabigeyenêt û têyda kuştare turkîyekey salî 1915 be “gelkujî” (“Genocide”) nawzed bikat. Belam hikûmetî Fransa piştîwanîy lem biryarey parleman nekird be biyanûy ewey kuştar û rawnanî ermen gerçî ciddîn, belam biryarî weha nabête handerî peywendyekaniman legel Turkiye û ew xebate sextey dekirêt bo dinedanî prosey dêmokrasî le Turkiye û herweha peywendîye nêzîkekanî Turkiye legel yekîyetîy Ewrûpa -da.

Yekem car Özal -î serkomar (1989-91) bû lem dozeda bêdengîye dirêjxayenekey Turkiyey şikand katêk raygeyand ke madam komarî Turkiye berpîrs nîye lewey le zemanî usmanîda kirawe, weha başe axaftin derbarey tawan radestî mêjûnasan bikeyn.

Peymanî serxobûn

Brîtanya û Fransa -y birawey yekem cengî cîhanî pêyan girîngtir bû nawçe dorawekanî dewletî Usmanî le Mêsopotamya (Îraq) û Sûrya -da dagîr biken, herçî Kurdistanî Turkiyeye belayanewe hem le rûy stratîjîyewe û hem le rûy abûrîyewe kemtir sûdbexş bû, cige leweş kontirolkirdinî giran dekewt. Brîtaniyekan deyanwîst sinûrî nêwan ereb û turk cêgîr bêt, kurdîş – le jêr sayey Brîtanyada – deşya bibête perêzî nêwanyan, bo nimûne le şêwey konfederasyonda.

Turk hoşdarîy dedaye kurd ke Brîtanya deyanxate jêr rikêfî erebewe, herdû layenîş, hem turk û hem brîtani, be giftî firewandinî otonomî, hewilyan deda kurd bo lay xoyan rabikêşin. Hêndey nebird zebirêkî gewre dira le otonomîy kurd. Mangî mayî 1919 leşkirî Yonan hate Smyrna (Îzmîr) û leşkirî Îtalya hate Antalya le kenarî başûrî Turkiye, emeş bepêy ew hêlkarîye Brîtanya û Fransa derbarey dabeşkirdinî Anatolya (pêkhatinî 1916 -î Sykes–Picot).¹⁷ Dengoy kuştarî musulman be destî yonanîyekan tirsî le nêw kurdda bilaw kirdewe, eman detirsan ermen le bakûrewe hêriş bânêt û le jêr sayey Brîtanyada le nawçey Anatolya-da Ermenistanî serbexo damezirênêt. Hikûmet le Îstenbûl, dij be planî mesîhîy hêrişber, wirey îslametîy xelkî debizwand û beweş hemû basêkî otonomîy kurd le gor nira.

Her ew deme Mustefa Kemal, ke taze serperîştyarî giştîy leşkirî noyemî dirabûye, le Samsun dabezî û le birî ewey fermanî Îstenbûl cêbecê bikat û çek û cebexane gird bikatewe, kewte handanî serok nawçekan bo rêkxistinî hêzî gel dij be hêrişberî biyanî: le xorawa dij be yonanyan, le Anatolya dij be îtalyan, le xorhelat dij be ermen û le başûr dij be Brîtanya. Katêkîş brîtaniyekan le Îstenbûl daway labirdinî Mustefa Kemal -yan kird, xoy destberdarî pêgey xoy bû.

Mustefa Kemal hewilî girdbûneweyekî mîllî deda bo damezirandinî Turkiyey serbexo le ser gişt ew xakey na-erebîye û bo ew mebesteş rûy le kurd na û pitir le hefta xêlî nawçe sinûrîyekan le başûr û le xorhelat bûne piştîwanî. Belam zor kurdî dîke nîgeran bûn çunke aşkira bû ke bolşewîkekan Mustefa Kemal -yan dilnya kirdibû le harîkarî dij be planî hawpeymanan bo damezirandinî Ermenistan -î serbexo û Kurdistan -î serbexo Leser xakî Anatolya.

Le peymannamey Sîver (*Treaty of Sèvres*) -î 1920 le nêwan hawpeymanan û dewletî Usmanî, rageynera ke kurd mafî xofermanî (otonomî) y xocêy heye û mafî heye paş yek sal serxobûnî tewaw helbijêrêt be mercêk “Komkarî Dewletan” (*League of Nations*) birway hebêt bewey kurd serxobûnî xoy pê deçerxêt. Belam nawçey diyarîkiraw xakî kurdî sûrya û Îraqî nedegirtewe, tenanet “Dêrsîm” (êsta nêw nirawe Tünceli) -y xoraway Furat -îşî nedegirtewe. Sinûrî nêwan Kurdistan û Ermenistan -îşî

¹⁷ *Peymannamey Sykes–Picot: “Sykes–Picot Agreement”* pêkhatinêkî nihênî bû salî 1916 le nêwan Brîtanya û Fransa -da bestira û paşan Rûsya -şî çûwe pal, bo diyarîkirdinî “bestênî deselat” -î her layekiyan le dabeşînî mîratî dewletî Usmanî.

diyarî nekirdibû. Belam kemasîy gewre birîtî bû le bêbayexîy em peymannameye çunke dewletî Usmanî be naçarî û le jêr dagîrkirdinî Brîtanyada wajûy kirdibû.

Hikûmete nasyonalîstanekey Mustefa Kemal le Ankara (Angora) le milmilanêda bû leger grûpî kurdî û turkîda ke peşewîyan le deştûder denayewe. Yonanîyekan be çawî berjewendewe deyanrwanîye raperînî kurdan le xorhelat çunke leşkirî Mustefa Kemal -yan xerîk dekird. Belam Churchill hoşdarî da derbarey metirsîy hengawî wehay dîplomasi û erteşkaraney hawpeymanan.

Kurd û nasyonalîstekan

Zalbûn beser yonanîyekanda ew rewayetî û bawerey be hikûmetî nasyonalîstanekey Mustefa Kemal bexşî ke çawerêy dekird, emeş derhawîştey tirsinakî bo kurd hebû. *Peymannamey Lausanne (Treaty of Lausanne)*¹⁸ hemû xwestêkî Turkiyey selimand, nawçey kurdîy Mûsil nebê, ke brîtanîyekan neyandewîst bîdorênin. Derbarey nawçe kurdîyekanî dîke, Brîtanya piştîwanî dekird le *“otonomî be reçawgirtinî mêjûy serbexoy kurd, dab, nerêt û taybetmendîyan”*. Ceneral Ismet İnönü -y serok şandî giftûgo, amade nebû biryarêk biselimênêt serxobûnî dewletêkî ermenî û kurdî bedemewe bêt. Turk eweşî nedeselimand gerentî bidirête kemîney musulmanî wek kurd û ereb (gerentî deba tenha bo kemîney namusilman bêt). Take mafêk kemîney etinî lêy selimêndira birîtî bû le *“azadane zimanî xoyan bekar bihênin bo axawtin le buwarî kesekî, bazar, dîn, çapemenî, weşanî hemecore û herweha le kobûnewey gîştîda”*. Mafîşyan hebû zimanî xoyan le dadgey turkîda bekar bihênin, gerçî zimanî ferimî turkîye.

Bo kurd peymannamey Lausanne nakamîyekî gewre bû, gişt umêdêkiyan bewey Brîtanya piştîwanî le serxobûnyan bikat, pûkayewe. Brîtanya û Fransa le beyannameyekî hawbeşda rojî 17 novemberî 1918 rayangeyandbû ke amancyan birîtîye le:

Rizgarbûnî yekcarekî û tewaw bo gişt ew gelaney maweyekî dirêje lejêr stemî turkdan û herweha damezirandinî hikûmet û rêberayetiyy millîy weha ke serçawey deselatî xoy birîtî bêt le piyadekirdinî azadaney wîst û destpêşxerîy xelkî xorisk.

Herçî başûrî Kurdistane xiraye ser Îraq, belam Brîtanya derikî kirdibû be pêwîstî *“fermandarîyekî englo-kurdî”* hem berjewendîy kurd reçaw bigirêt û hem derfet bidate kurd paş sê sal dîsanewe şewazî berêwebirdinî nawçekey xoy bixatewe helsengandin. Winston Churchill ew deme wezîrî kolonîyekan (*“Colonial Office”*) bû, raygeyand *“kurd ger xoy neyhewêt, nabêt bixirête jêr rikêfî erebewe”*. Belam wîstî ereb corêkî dîke bû, Brîtaniya -ş peymanekanî xoy şikand.

Ber le serxobûnî tewawî Îraq, salî 1932, gişt serxêle kurdekanî başûrî Kurdistan rûyan le *“Komkarî Dewletan”* û / yan le *High Commissioner* y Brîtanya le bexda na û xwaznameyan pêşkeş kird bo daway xofermanî û tenanet daway serxobûnyan dekird le jêr sayey Brîtanyada. Herweha cexitîşyan dekird Leser ewey hikûmetî Bexda şikestî hênawe le cêbecêkirdinî mercî *“Komkarî Dewletan”* ke rêgedane be xwêndin be zimanî kurdî û herweha bekarhênanî zimanî kurdîye le layen karbedestanîy ferimî nawçekewe. Wêray eweş Îraq paş serxobûn, le layen *“Komkarî Dewletan”* ewe wek endamêkî pîrbayex selimêndira.

¹⁸ Peymannamey Lausanne 1923-7-24.

Xêlêkî behêzî kurd, be rêberayetîyê şêx Ehmed Barzanî, le fermandarî erebî raperî, ewanîş be piştîwanîy firokey bombihawêjî Brîtanya, şêxyan berew çiya raw na. Lewê xoy radestî leşkirî turkî kird – ewanî pê baştir bû le erteşî Îraq. Birakanî şêx dirêjeyan be xebat da belam paş salêk (1933) ewanîş naçar kiran çek danên û swêndî wefa û hogirî bo melîk Feysel bixon. Hokerî biryarder lêreda firokey bombihawêjî brîtanî bû, delên 1365 xanûy 79 gundî rimand. Kurd yekêke le yekemîn qurbanîyekanî bombaranî firoke dij be amancî sîvîl.

Le kurdim bîstûwe goya azarî wîjdane lay brîtanîyekan beranber helwêstî ew serdemane ke paş nêzîkey şêst sal bûwe hoy *Operation Provide Comfort* – dabînkirdinî nawçeyekî xoferman (otonom) bo kurd le bakûrî Îraq paş cengî Kendaw. Mexabin dabînkirdinî em nawçe parêziraweyîş nebûwe hoy yekbûnî kurd. Cûte serxêl, Barzanî û Talebanî, yekemyan serokî partî dêmokratî Kurdistan KDP û dûhemyan serokî yekîyetîy nîştîmanî Kurdistan PUK, neyan twanî pêk bênen lesêr hêlsûran û parastinî nawçeke û rêkxistinî abûrî û siyasî. Nakokîyan geştişte lêk sîrewandin û corêk le şerî nêwexo. Emîş bûwe hoy binkolkirdinî birwahênan be xebatî kurd bo serxobûn.

Derbarey bakûrî Kurdistan, parlemanî mîllî le angora (Ankara) rojî 10 -y şubat (sibat, *February*) 1922 biryarî da “fermandariyekî otonom bo mîlletî kurd damezirênêt hawaheng bêt legel dabunerêtî mîllî xoyan”. Biryar weha bû le helbijardinî azadda parlemanêkî mîllî kurdî bête damezirandin, belam parlemanî mîllî le Ankara mafî pesendkirdinî fermandarîyê giştî ke mîllet le nawçey otonomda helbijardûwe û herweha mafî fermandarîyê cendermeş le Kurdistan, bo xoy terxan kird. Ewca zimanîş le parlemanî mîllî kurdîda deba turkî bêt.

Kurd lem sinûrbendîye zor dilşkaw man belam neyantwanî hîç helmetêkî yekgirtû biniwên beranber planekanî Ankara. Lew demeda Mustefa Kemal core otonomîyekî bo kurd selimand belam deselatî siyasîyê lê zewtkirdin. Paş salêk Turkiye dengî girtir bû. Hîç amajeyek be Kurdistan le dokumentî ferimîda bûnî nema û kurdîş ziyadtir wek kêşe bo yekbûnî welat nawzed dekirin. Seyr lewedaye mêjûnûsan raydegeyenin ke hoy girîngî em ragorîyey mustefa kemal, kurdêk bû: Ziya Gökalp¹⁹ -î feylesûf û civaknas.

Gökalp salî 1920 kitêbêkî bilaw kirdewe be nawî “*Binemakanî turkayeti*”. Boçûnî em kitêbe deygut hogirîyê civakî û harîkarî lesêr binemay hawferhengî dirust debêt, emîş le fêrgewe degiwazirêtewe.

Mîllet (nasyon) birîtiye nîye le grûpêkî etnî, ciyografî, siyasî yan dilxwaz, birîtiye le grûpêk xelkî xawen zimanî hawbeş, dînî hawbeş, akar û ciwanînsayî hawbeş, wate kewanêk xwêndinyan hawcor bêt.

Em boçûne rêk dehat legel dîdî Mustefa Kemal bo dirustkirdinî dewletêkî mîllî turk le têkeley reçekekî netewey ciyawaz lesêr şêwazî ewrûpî, wate awêtekirdinî mîllet le çêwey komarda û dijayetîkirdinî dabiran û kenargîrî. Gişt mîratî Usmanî û herweha hemû nerêt û zaraweyekî taybet ke bibête rêbest le dirustkirdinî Turkiyey niwêda debêt wela binrêt. Nawî kurdî gora be nawî turkî, zimanî kurdî le xwêndin û le dadgeda yasax kira. Fêrgey dînî daxiran û beweş dûwa derfetî xwêndinî kurdî çû.

Raperînî şêx Seîd

Mangî marsî 1924 kota be xelafet hênira û emeyan dûwa dilopey sebirî kurdî çorand. Sazimanêkî niwê be nawî “Azadî” helnira û kurdî ko kirdewe be mebestî raperîn bo damezirandinî Kurdistanî

¹⁹ Ziya Gökalp (1876-1924) kurdî şarî Amed -e.

serbexo. Danûstanî kirçukal, hawahangîy narêk û kemasîy le razgirîda yekem hewilî lebar bird û çendîn rêber kewtine zîndanewe.

Belam şêx Seîdî Palû twanî le beharî 1925 da serxêl û serhozî yaxî ko bikatewe bo raperînêkî çekdarney niwê dij be Ankara, dawakarîş birîtî bû le damezirandinewey xelafet û herweha damezirandinî hikûmetî kurdî. Şêx Seîd le nêw îslamî sunineda, serbe rêbazî Neqşbendî bû, her leber eweş jimareyek zorî kurdî elewî xoyan dûr girt le raperîneke, tenanet layenî leşkirî turkyan girt.

Şêx Seîd serkewtûwane be hezaran piyawewe pelamarî Diyarbekirî da, belam Mustafa Kemal 52 hezar serbazî taw da bo serkutkirdinî raperîneke. Serbaz dewrey kurdyan da û rêberkanyan girtin. Sizadan dirindane bû. Rojî 4 sêptemberî 1925 şêx Seîd û 46 rêberî dîke le Diyarbekir le sêdare diran. Dadgey taybet 7500 kesî girt û 660 -î tîrbaran kird. Serxêl û şêxan giwêziranewe bo xoraway Anatolya, gund sûtêniran û ajel talan kiran.

Gustaf Wallenberg²⁰ delêt: “Raperînekey Kurdistan be “şerî Dacke”²¹ -î komarî turkî deçû”. Mebestîşî eweye arastey rêformî pêgîr le rastîda letex xwastî zorînedan yekî nedegirtewe û derencamîş, ger mirov amadey destberdarî nebêt, debêt hemîşe be çing û dendûkan dakokîyan lê bikat. “Layengiranî rêform hem le helsegandinî hêzî serkewtinî bîrokekanî xoyan zêderoyîyan kird, hem le helsegandinî deselatî nerêt le naxî mîlletda kurtpêwîyan kird”.

Wallenberg pêy waye dirêjedan be prosey dadge dij be şêx Seîd û hevalanî mebestêkî taybetî hebû, ewîş abirûbirdinî berhelistkaran û mêdyay berhelistkar bû. Weha radegeyendira ke em şêxe bertawanane:

Bo em raperîne bezîweyan, her nebêt be şêweyekî tiyan (narastewxo) îlhamyan le bûnî aşkiray partî berhelistkar wergirtwe û betaybetî lew mebeste penhaney eman le bernamey ew parte derkiyan kirdûwe, betaybetî ew xaley daway rêzgirtin dekat le bawerî dînî, serincî emani rakêşawe. Derencamîş geyişte ewey partî komarxwazî pêşrewt helweşênrêtewe leber ewey deyhewêt şîraze, aramî û asayîşî welat bişêwênêt.

Nek tenha berhelistkaran, bigire hêzî derekîş tawanbar kiran bewey destyan heye le raperînî kurdda, ber le hemwanîş Îngland. Le kurtenûsî rojnamanda hatûwe goya şêx Seîd le şwênî lesêdaredanîda pirsyarî lê kirawe:

- Deysa rast û dirust pêm bilê, be boçûnî êwe kê bedkartirîn dujminî Turkiyeye?

Şêx be rûnî gutî:

- Helbet England -e!

Ewca yek le endamanî dadge bem boneyewe lêy pirsî:

- Ewcaş ténagen ke Turkiye le rastîda êstaş parêzerî îslame?

Tenha welamî şêx lêreda:

²⁰ Bazirgan, dîplomat û siyasetmedarî swêdî Gustaf Oscar Wallenberg (1863- 1937), salî 1920 bûwe “balyozî rasparde” - “Envoy” -î Swêd le Îstenbûl.

²¹ Şerî Dacke: amajeye be raperînêkî cûtyaranî deverî Småland -î Swêd le salanî (1542-1543) da be rêberayeti Nils Dacke (1510-1543) dij be Gustav Vasa (1496-1560) ke le nêwan (1523–1560) paşay Swêd bûwe.

- Ger xuda bîhewêt, weha debêt.

Emane dûwa gutey şêx bûn.

Le rastîda, hem şêx û hem bertawanekanî dîke le hemû mawey dadgekeda berdewam nikûlîyan dekird lewey hîç mebestêkî nasyonalistaney kurdaneyan hebûbêt yan hîç peywendîyan girtibêt legel hêzî derekîda. Wallenberg denûsêt:

Eme wêray ewey ew hewiley Turkiye deyda, ke lewe deçêt le layen dadûwerekane we saz kirabêt - ke deba le rwangey Turkîyewe hele bêt - bo ewey naçaryan bikat ew tawaneş biselimênin. Bepêçewane, hokarî em raperîne, be gutey xudî rêberanî yaxîyekan birîtî bû lew biryare metirsîdarey komarî Turkiye be pekxistinî şerîe (qanûnî îlamî) – hîçî dîke nîye.

Xêzanî şêx Seîd welatbeder kiran. Yek le newekanî şêx, Ebdulmelîk Firat, salî 1957 gerayewe Turkiye û helbijêra bo parleman, belam paş her kudtayekî serbazî - 1961, 1971, 1981 - be tawanî dabiranxwazî²² -y kurdane degîra û zîndanî dekira. Firat delêt:

Le paş raperînî bapîremewe kemalistekan herdem xêzanî êmeyan be mayey handerî raperîn danawe". Le rastîda xirap le bapîrim geyîştûn. Bapîrim rêberayetîy şorişî 1925 kird çunke têgeyîştû lewey ferhengî îlamî, ke take bende kurd û turkî ko kirdotewe, xerîke heldeweşêtewe û gorankarîy weha le ayendeda debête mayey kêşe bo herdû civak.

Firat cexit dekat leser ewey gelî kurd noreyekî girîngî hebûwe le xebat bo damezirandinî dewletî Turkiye. Mustefa kemal cengî xoy le xorhelatî Turkiye gir da, be şêx û axakanî kurdî rageyand ke em xebate xebatêkî hawbeşe bo turk û kurd, beweş kurdî rakêşa bo berey xoy.

Firat delêt:

Le Turkiyeda çîdî rêberî siyasî nemawin. Emaney hen kesanî bistebala û bîrokratin û fermanî erteş cêbecê deken. Em rijême pêwîstî be nojenkirdinewe û saxtargorîye. Etatuk wek xuda seyr dekirêt û tenanet pêşnyaz bo gorînî binemakanî ew nayene selimandin.

Firat delêt çîwar milyon kes piştîwanî le xêzanekey em dekat û emîş leser rêbazî ew xêzane xebat dekat bo aşî û birayetî.

Wêray xefekarîy tundî dewlet dij be kurd paş raperînî Seîd, serhelidan le kotay salanî 1920 û le mawey salanî 1930 da le deverî ciyawazî Kurdistan dirêjey hebû. Herweha le xoraway Turkiyey serpeçîy gelêr beranber çewsandinewe dîn rûy deda. Le şarî Menemem î nêzîk Îzimîr alay raperîn be rengî keskî pêxemberewe dij be "kafirana" salî 1930 helkira, serbazekan pelamarî xelkiyan da, rêberyan girt û le milyon da. Emeş şerî dîkey lê kewtewe û sê yaxî têda kujran. Sereta em rûdawe be derhawîşteyekî sinûrdarî demargîrîy derwêşane pêşan dira, belam paş çend rojêk rageyenira ke eme

²² Dabiranxwazî: Separatism.

nawerokî zor qûltir û cîddîtirî heye. Mustafa Kemal em tawaney xiste estoy koneperistan û “debêt wek pelamardanêkî komar seyr bikirêt”. Dadgey ceng fermanî mergî da beser 37 beşdarî ew raperînedan û le sêdare diran.

Çend kesêkî ew raperîne, her wek şêx Seîd, serbe rêbazî Neqşbendî bûn ke le salî 1925 qedexa kirabû, belam aşkira bû ke hêştan mawe. Carl von Heidenstam î cêgirî Gustaf Wallenberg bem encamgîrîye degat:

Deselatî balay peywendîdar le serûbendî helweşandinewey rêbazî dînî û sepandinî deselatî dewlet beser tekîyey em rêbazaneda tewaw pey nebirdibû be em core peywestane çî bayexêkiyan heye bo beşêk le gelî Turkiye. Hikûmet pêy weha bû le rêy fermanî helweşandinewe bitwanêt kota bem komelane bihênêt keçî hanîdan bo çalakîyê jêzeminî û pîlangêrî.

Rêbazî “*Birayanî musulman*” wek rêbazî Neqşbendî, lay kemalîstekan be komeley nihênî dadeniran ke demargîrîyê sakaraneyan deşya xelk han bidat dij be serokayetîyê dewlet. Kemal deywîst mîllet perwerde bikat bewey be roşinayî rastîyekanî zanist destberdarî hemû boçûnêkî xurafepêstî bibin.

Bon Heidenstam denûsê: “belam sengiyan her ma”. Heta emroş ew rêbaze nihênîyane sengiyan le hemû katêk ziyadtire. Turgut Özal î serwezîr (1983-89) û serkomar (1989-91), serbe rêbazî Neqşbendî bû belam hawkat lîberalêkî doste xorawa, şorişêkî abûrî le Turkiye berpa kird. Sekularekan tawanbaryan dekird bewey mizgewt zor dirust dekat û derwazeyê supa bo îslamîstekan dekatewe. Îslamîstekanîş tawanbaryan dekird bewey bêferhengî û gunahî xorawa dehênête Turkiyewe. Özal pêy le herdû bereda bû, çêjî debînî lewey hawsengîyekî xeternak rabigirêt, emeş begîştî cêy sersamîyê turkan bû. Bem şêweye Özal bûwe bercestekekirinî core xewinêkî turkî: hem musulmanêkî baş bêt û hem “xorawayî” yekî serkewtû.

Ew deme deverêkî kurdîyê betaybet peşew, deverî dêrsîm bû, be turkî nawî lê nira Tünceli. Salî 1937 be mebestî rîşekêşkirdinî wîstî bergirî lem devere, 25 hezar serbaz hate dêrsîmewe û salî paşan kirane 50 hezar. Salî 1946 ewca “*doxî nalebar*”²³ leser Tünceli la diran, ew sale bû “*dêmkorasîyê parlamantari*” xiraye kar.

Dêmkorasîyê, traktor û kudetayê serbazî

Le kotayê salanî 1930 ekanewe kurd be “*turkî çiyayî*” nawzedê kira û diyare beweş mafî damezirandinî partîyê siyasîyê kurdaneş qedexa kira. Kurdêk xulyayê siyasatî heba rûy le partîyê dîke dena, serxêlekan rûyan le parte rastirewekan dekird û cewanîş le çepirewan. Letek eweşda, le salanî 1960 da partîyê nihênî sazê kira, partîyê dêmkorasîyê Kurdistanî Turkiyê KDPT, be rêberayetîyê çend axayek û rêbazêkî konewar (konsêrvatîv) -î nasyolîstaneş girte ber. Kurdî radîkal ziyatir deçûne pal partîyê sosyalîstî lêgal²⁴ “*partîyê kirêkaranî Turkiyê*”, tenanet elewîyê çewsa weş rûyan lem parte dena.

Birewî pîşesazî û traktor-karî le salanî 1950 da helûmercî guzeranî kurdî gorî. Geşeyê pîşesazî le xorawayê Turkiyêda cewanî hejarî gundîyê kurdî han deda bo koç berew şar, lewê be mûçeyê baştir karyan dest dekewet. Birewî traktor bûwe mayeyê mîkanîkandin û nêwendgîrandin²⁵ -î kiştukal û

²³ Doxî nalebar: State of emergency.

²⁴ Lêgal: Legal, moletdar, rê pêdiraw.

²⁵ Mîkanîkandin û nêwendgîrandin beranber *mechanization* û *centralization* danirawin.

bemeş zor wirdecûtyar bêkar man û gewrecûtyar zengîntir bûn. Axa traktorî bo cûtyar dabîn dekird beweş peywestbûnî cûtyar be axa tundtir debû. Yeşar kemal le çendîn romanda be derkêkî qûlewe bas lew gorankariye dekat ke şorişî traktor berpay kird.

Kirêkarî kurd xoyan le nêw sendîkay kirêkaranda rêk dexist û bîrmendan²⁶ le sazimanî ferhengî û siyasîda, daway mafî siyasî, civakî û abûrîyan dekird. Fêrxwazî radîkal xizane nêw bizavî şorişgêrane û destey gerîlay şarnîşnewe, emanîş paş kudetay serbazîy 1971, le layen supawe lêdiran.

Le 1970 kanda xebatî aydyolojiy nêwan rastirewan û çepirewan çendîn nakokîy dîkey hem deşardewe û hem be sûdî xoy deçerxand: nakokîy nêwan turk û kurd, nêwan sunine û elewî, nêwan îslamîst û kemalîst, nêwan şarnîşîn û gundîy koçber. Le nêwan 1973 û 1977 da nêzîkey 500 fêrxwaz le peşewî û pêkdanda kujran. Grûpî rastirewî pergîrî here tirsinak birîtî bû le “gorgebor” (“bozkurtlar”) ke pelamarî komunîst û kurdyan deda çunke ewyan nasyonâlîst nebû, emyan turk nebû. “Gorgebor” le pişt komelkujîyekey 1978 bû ke le şarî Mereş²⁷ -î kurdnîşîn ziyadtir le 100 kes kujra û 500 dukan û xane wêran kiran. Hikûmet “doxî nalebar” -î le nawçe kurdiyekan rageyand. Belam peşewî dirêjey kêşa û heşt mang paşan nêzîkey çiwaz hezar kesî dîke hatine kuştin.

Erteş le 12 y septemêrî 1980 da bo carî sêhem le paş cengî dûhemî cîhanîyewe (zûtir le 1960 û 1971 da) helmetî bird, hikûmete sîvîlekey xist û peymanî da bezûtirîn kat paş ewey salarîy hikûmet cêgîr debêtewe, deselat bidate dest hikûmetî sîvîl. Zor kes lewaney beserhatî ew serdemane degêrnewe delên barûdoxî welateke tewaw peşokaw bû, her detgut anarkîstaneye. Leber eweş bû zorîney bêdeng pêşwazî lew kudeta serbazîye kird. Leşkir gişt parte siyasîyekanî qedexe kird, serok partekanîş yan zîndanî bûn yan destbeser. Le mawey ew 3 saleda ke welat le jêr rikêfî leşkirda bû, ziyadtir le 600 hezar kes xirane zîndanewe, beşî here zoryan serbe parte çepirewekan bûn. Amarî ferimî deygut nêzîkey 4500 kurdi dabiranxwaz (cyaxwaz, separatîst) hatine girtin, belam sazimanekanî mafî mirov delên jimarey kurde gîrawekan zor ziyadtir bû, nêzîkey 80 hezar kes bû, ke aşkiray dekat dozî kurd zor lewe firewantir bû ke leşkir deydirkênêt. Be mebestî cilewgirtinî barûdox, nêzîkey dû le sêy leşkir le nawçey kurdnîşînda pêwer bûn.²⁸

PKK

Mangî august -î 1984, yek sal paş ewey leşkir fermanî radestî hikûmetî sîvîl kirdewe, partêkî nenasirway kurdi, *Partiya Karkerên Kurdistan* - PKK kewte pelamardanî amancî erteşî le nawçe kurdiyekan. PKK le salanî 1970 da le layen kurdekewe be nawî Ebdula Öcalan, nawzed be Apo, hate damezirandin. Delên goya Apo le temenî cewanîda musulmanêkî bawerdar bûwe, serincî hevalanî xoy rakêşawe bewey ayetî quranî ezber bûwe. Xalî werçerxan le zîndanî Ankara bû salî 1970, lewê paş rêpêwanêkî bêmoletî fêrxwazan, Öcalan heft mang zîndanî kira. Hevalanî zîndan hênayane ser bawerî sosyalîzîmî zanistane. Paş mawey zîndan Öcalan gerayewe başûrî xorhelat bo çerxandinî xebatî azadîxwazîy PKK.

Ewey niwê bû le xebatî nasyonâlîstaney PKK -da birîtî bû le rîşalî xebatî çîneyetî. Bernamey PKK Leser boçûnî marksîst - lînînîstane darêjra bû. Dujmin be dîdî PKK tenê “gorgebor” -î faşîst û sîxurekanî

²⁶ Bîrmend: roşinbîr, *Intellectual*.

²⁷ Şarî Gurgum, Mereş.

²⁸ Pêwerbûn: *Deploy*, bo bilawbûnewey rêkûpêk û dameziranî leşkire. Birwane: Celizade M.M. “Zarawesazîy pêwane”: www.mamosta.net.

dewlet nebûn, bigire herweha çîni mulkdarî kurd, serxêl û serhozi konewariş bûn. PKK fêr bû çon sûd le dujminayeti xêlekî bibînêt bo rakêşani layengîr – kesêkiş le xêzan yan le xêlda layengîri PKK bêt ewa layengîri gişt ew xêzan û xêle desteber debêt. Leber eweye sexte jimarey layengiranî PKK mezende bikirêt.

Katêk PKK destî daye xebati çekdarî, parteke 200 çekdarî hebû. Le seretay salani 1990 da PKK be gutey dewleti turki 15 hezar çekdarî hebû belam PKK xoy delêt 60 hezar.

Bazirganêki kurd ke salani 1990 partêki liberalî damezirand û daway dekird em cenge kota bêt, deygut be kuştini her kurdêk jimarey layengiranî PKK ziyad dekat û be kuştini her turkêk jimarey dujminani PKK ziyad dekat. Herdû layeni em nakokiye ke dête ser qurbanîyan, jimarey ciyawaz deden. Layeni hikûmeti delêt jimarey kujraw le 30 hezar kes ziyadtire, û beşi zoryan yan PKK -en yan xelki sîvil. Belam PKK delêt zorîney kujraw serbazî hikûmetin. Ew jimaraney le herdû lawe repêş dexirên “*body count*” -î cengi Vîyetnam dehênêtewe yad ke biriti bû le serxistinî wirey ceng be ziyadkirdini jimarey kujrawani ewla û kemkirdinewey jimarey kujrawani xo. Her wek cengi Vîyetnam xelki sîvil le nêwan dû sengerda gir dexon.

Bedem firewanbûni xebati çekdarîyewe, derfeti kurd sextitir debû bo xo ladan lew nakokiye: ewey legel ême niye, dijmane - yan lewla debête: ewey be rûni dij niye, legele. Bo rizgarbûn le guman û hereşey herdû la, bo rizgarbûn le zordari û siza, ewey twanay hebû berew şarekani xoraway Turkiye koçi kird. Ewaney dike rûyan le nêziktirin şari xorhelat na. Cengejimare delêt le nêwan yek û niw heta sê milyon kes başuri xohelati cê hêştûwe, yek hezar ta sê hezar gund çol kirawn, hezaran fêrge daxirawin, ziyadtir le yek milyon mindal fêrgebederin. Herdû la yektir tawanbar deken: PKK tawanbare çunke sizay ew kurdane dedat ke piştîwanî PKK naken, hêzi asayiş tawanbarin ke deyhewêt PKK le piştîwanîy mîllet dabibirêt. Ewey layek nawî denêt çolkirdin, ewey dike nawî denêt taktiki xaki sûtaw.

Seretay salani 1990 danîştwanî Diyarbekir ke paytextî nawçekeye, le 350 hezarewe geyişte serûy yek milyon, Batman le 150 hezar kesewe geyişte 500 hezar kes. Şarekani dikeş her weha. Kurd, hejari şaristani, zor debêt û emane be asani dekewine bertawî PKK û bizavi dikey radikalî siyasî. Zor kes twanî berew henderan koç bikat bo Almanya, Skandinavya û Holand. Lew dû milyon turkey Almanya ziyadtir le 300 hezari kurde. Kewate henderaniş radekêşirête nêw em nakokiye.

Katêk lenakaw 12 y novemberî 1998 Öcalan le şari Roma serî helda dozi kurd bûwe babeti şalaperey rojnamekani gişt cihan. Sûrya paş hereşey tirsinak le layen serokayeti leşkirî turkewe seretay mangi oktober Öcalan -î derkird û emiş rûy le Mosko na, lewêş daldeyan neda û naçar rûy le Îtalya na çunke lewê çend komunîstêk û çend nûserêki serbe “*keskekan*” hawsoziyan beranber PKK pêşan dabû. Mangêk ber lewe “*parlemanî henderan*” -î kurdî rêgey dira bû le Roma civini hebêt û le holekani parlemanî Îtalyada konferensi rojnamewanî bigirêt. Lewe deçêt PKK pêy weha bûbêt Îtalya şwênêki lebare bo ewey le xaki Yekiyeti Ewrûpa (*European Union - EU*) we helmetêki siyasî berpa bikat beranber Turkiye be mebestî çarekirdini dozi kurd. Turkîş demudest dawayan kird ew rêberey PKK -eyan radest bikirêt ke bertawani kuştin û têrorizime. Turkiya gişt pêşnyazêki ret kirdewe corêk gutûbêji têda bêt.

Kurd le gişt layeki Ewrûpa -we be şalaw hatine Roma û hiç welatêki ewrûpi xoy lem base negiland, hikûmeti Îtalya peşiman bowe û biryari da miwanekey xoy der bikat. Mangi januari 1999 Öcalan le Îtalya nema û “*sernigum*” bû heta serweziran Ecevit raygeyand ke Öcalan 15 -î mangi februari le şari Nayrobi²⁹ girawe û hênirawete Turkiye bo dadgayi. Televizyon Öcalan -î pêşan deda, dem û dest

²⁹ Nayrobi -y paytexti welati Kinya.

bestiraw, be kelepîçewe le nêw firokedaye û serbazî asayîş deyfîrênin. Wênekan bîneranî tîvîyan le xorawa hejand, tenanet ew kurdaney hergîz laynegîrî PKK nebûn pêşanyan da wênekan çî hawsozîyekî peyda kird. Öcelan bûwe hêma bo mîlletî kurd ke çon le layen turkewe çawîşkên dekirêt, turk deyewêt ser be PKK şor bikat û pêşanî bidat ke rêberekeyan ew hêze efsûnawîyey dorandûwe.

Her zû kardanewey kurd be şêwey helmetî çekdaraney rêkûpêk kewtine dagîrkirdinî balwêzxane û konsulxaney yonanî le gişt Ewrûpa -da. Öcelan le Nayrobî le balwêzxaney yonanî bû, lewê hêniraye derê be zor yan be firîw. Beweş Yonan be beşdar zanira le girtinî Öcelan -da. Mêdya turkîş bizew xoşî dehat û deygut deba Ewrûpa baş le makî sazimanî PKK bigat.

Dagîrkirdin û barimtegirtin nebûne hoy ziyadkirdinî hawsozî bo dozî kurd. Le Yonan hikûmet tûşî sextang (qeyran) bû, sê wezîr, yek lewan Pangalos³⁰ -î wezîrî karûbarî henderan, le hikûmet la diran. Hikûmetî Swêd helmete naqanûnîyekanî PKK -ey ret kirdewe û raygeyand ke PKK niwênerî zorîney kurdî Turkiye nîye.

Le Turkiye, girtinî Öcelan, şepolêkî nasyonalistaney bizwand û eweş bûwe hoy serkewtinî partî DSP -î Ecevit û partî MHP -î nasyonalist le helbijardinî parlemenda, mangî aprîl -î 1999 be sedî 22 deng bo ewyan û 18 bo emyan. Partî *Fezîle* -y îslamîst kewte xaney sêhemewe û 15 le sedî dengî hêna.

Aye dozî kurd çarey heye?

Helbete welamî em pirsyare bende bewey mebest le çare çîye. Layen û berjewendxwazî ciyawaz xawen pêşnyazî ciyawazin bo çareser. Lêreda pêşnyaze here girîngekan bas dekem û hewilîş dedem pêşanî bidem ta çî radeyek derfetî piyadekirdinyan lebare.

1. Dabiran (Secession)

PKK le bernamey siyasîy 1983 y xoyda raydegeyenêt ke amanc birîtîye le damezirandinî dewletî kurdî le başûrî xorhelatî Turkiye wek hengawêk berew Kurdistanî mezinî yekgirtû, ke welatî kurdanî dewlete hawsêkanîş bigirêtewe.

Nawçey kurdnişîn le başûrî xorhelatî Turkiye nêzîkey 230 hezar kîlometirî dûca degirêtewe, nêzîkey çarekêkî xakî Turkiyeye. Lem nawçeyeda nêzîkey nîwey kurdî Turkiye nîştêcên, nêzîkey şeş milyon le koy 12,5 milyon kurd. Ger Turkiye 62 milyon danîştûy hebêt ewa pêncyekî kurde. Ger nawçey başûrî xorhelat le Turkiye dabirêt û Kurdistanî serbexo saz bêt lewaneye kurdî nawçey dîkeş koç biken bo Kurdistan belam giştyan na, betaybetî ewaney baş awêtey civakî turkî bûn nagerênewe Kurdistan, bo nimûne zorîney ew 2,5 milyon kurdey mezende dekirêt le Îstenbûl bin.

Kêşey dabiranî nawçeke beweş aloztir debêt ke em nawçe kurdnişîney başûrî xorhelat hejartirîn nawçey welatekeye û derfetî guzeranî başî têda nîye. Wek basiman kird, koçî rûwew xorawa le salanî 1950 we destî pê kirdûwe û le salanî 1980 -kanda be hoy tejendî abûrîyewe zor ziyadî kird û ewca le newedekanda cengîş bûwe hander. Koç le nawçey kenarî Reşezerya-ş her zore, ewîş nawçeyekî hejare, belam kurdî lê najî.

Kurd le dewletanî hawsêda, wêkra jimareyan hawşanî kurdî Turkiyeye: le Êran 7 milyon, le Îraq 4,5 milyon û le sûrya yek milyon. Ca leber ewey seranî ew dewletaneş her wek seranî dewletî Turkiye amade nîn destberdarî xak bin bo dirustkirdinî dewletêkî kurdîy serbexo, rêgey kokirdinewey gişt

³⁰ Theodoros Pangalos (1938-) siyasetmedarêkî nawdarî yonanîye û le endamî serkirdayetîy PASOK -e.

kurd le yek dewletda heta maweyekî berçaw daxiraw diyare. Wêray ewey parte siyasîyekanî kurd le Îraq, KDP be serokayetîy Barzanî û PUK be serokayetîy Talebanî, piştîwanî le bernamey PKK naken bo damezirandinî Kurdistanî mezin, belkû rayangeyandûwe ke deyanhewêt beşêk bin le Îraq -êkî federal, dêmokrat û parlemanî.

Gerçî Turkiye heta maweyekî dîkeş piştîwanî le *Operation Provide Comfort* dekat ke paş cengî *Kendaw* nawçeyekî asûde (*safe haven*) -î bo kurd le bakûrî Îraq terxan kird, bo ewey carêkî dîke naçar nebin pena bo Turkiye berin (2 milyon koçber salî 1991 le taw bordumanî Îraq berew sinûrî Turkiye û Êran helatin), belam Ankara tirsî heye lewey em nawçe asûdeye bibête awlemey³¹ dewletêkî serbexoyî kurd be hemû ew derhawêştaney deybêt bo asayîş û yekîyetîy xakî Turkiye. Lem nawçeyeda boşayî serbazî peyda bûwe û PKK derfetî lê hênawe bo damezirandinî bingey be mebestî pelamardanî Turkiye. Hêrişî serbazî Turkiye be 35 hezar serbazewe bo bakûrî Îraq le mars – aprîl -î 1995 bo têkdanî ew bingeyane bû. Ew hewileş diyare bêşûd bû, çunke pelamardanî serbazîy lew core çendbare debêtewe. Ewca Turkiye dawa le KDP û PUK dekat PKK lew nawçeyê nehêlin û beranber ewe yarmetîy abûryan dedat û bazirganîy sersinûryan bo hemwar dekat. KDP ke nawçey hawsinûrî Turkiyey bedeste baştir giwêrayelî dawakarî Turkiye bû wek le PUK ke nawçey hawsinûrî legel leşkirî Saddam Huseyn -da heye.

2. Federasyon

Apo Öcalan -y rêberî PKK çendîn car amadeyî xoy pêşan dawe bo giftûgo derbarey çareserêkî federalî legel hikûmetî Turkiyeda. Le dîdarêkî 10 marsî 1997 legel rojnamey *Dagens Nyheter*, Öcalan gutî sîstemêkî berînî federalî zor lebartire bo hemwan wek lem parçeparçebûney kurd. “Emeyan çareserî here nimûneye bo hemû em ferheng, dîn û mîllete têkbestaney kurd beşêke lêyan”. Öcalan derbarey ew çareserey zûtir rageyenirabû - Kurdistanî serbexo – gutî eweyan aydyolojîye, belam êsta em doze le rûy siyasîyewe pênase dekirêt. “Aydyolojî leser binemay hizirîy wird heldenirêt. Siyaset birîtîye le nermekarî”.

Belam kem turk heye birwa biken bewey PKK le salî 1984 we decengê û le mawey em 15 saleda çendîn hezar layengirî xoy kirdote qurbanî bo ewey Ankara razî bikat be selimandinî federasyonêk le Turkiyeda be herêmêkî kurdîyewe xawen xofermanîyekî helkişîw. Turkiya çon herêmêkî marksîstane le welatî xoyda deselimênêt? Çend dexayênêt heta ew herême be herêmêkî azadkiraw radegeyênrêt û serxobûnî xoy beyan dekat? Rêberanî em herême kurdîye çon berpirsayetîy bergirî û siyasetî derekî becê dehêlin bo deselatî nêwend le Ankara û dilkêş nabêt bo piyadekirdinî siyasetêkî serbexo beranber nawçe kurdnişînekanî dewletanî hawsê? Ewsa girjî le nawçekeda ser heldedat û dûr niye asûdeyî gişt nawçeke bixate metirsîyewe.

Hîç siyasetmedarêkî turk niye, tenanet here lîbiralekanyan, piştîwanî le pêkhatay federalî kirdibêt, gerçî heye delêt em bîrokeye debêt bixirête giftûgowe. Tenanet serwezîranî pêşû, Tansu Çiller gutbûy Basik (“*Basque*”) deşêt nimûneyek bêt bîrî lê bikeynewe bo Turkiye. Ewca konewaranî nêw partekey xoy lew bîrokeye rasan û belgeyan dehênayewe bewey gerçî Bask mafî xwêndin û pexşî tîvîyan heye be zimanî baskî û gerçî xofermanîyekî helkişîwî siyasîyan heye, belam sazimanî ETA leser têrorîzimî xoy her berdewame. Cige leweş bazirganêkî nawdarî Turkiye nimûney Bask -î hênaye berbas belam kewte ber hereşey dadgayîkirdin. Bemeş lewe deçêt em base ta maweyekî dîke le rojevî siyasîda cêy nebêtewe.

³¹ Awleme: korpeley carê nezaw.

Tirsî gewre le xofermanîy helkişîwî herêmî birîtîye le metirsîy geşekirdin. Lêreda bo nimûne amaje be Puncab dekirêt ke sîx xofermanî bo selimêndira ewca kewte daway Xalîstan -î serbexo.

3. Otonomîy ferhengî

Eger otonomîy herêmî bijare (elternatîv) yekî nalebar bêt, ewa otonomîy ferhengî çareyekî lebare. Emyan be piley yekem birîtîye le xwêndin be zimanî kurdî û herweha pexşî radyo û tîvî be kurdî. Em mafgele debine mayey pitewkirdinî “*nasnamey kurdî*”. Emîş çemikêke tenanet serok Demirel lêy dûwawe, belam eweşî xistote ser ke mafî weha paş zalbûn beser têrorîzîmda ewca dête berbas.

Le serûbendî dozî kurd le Îraq derwazeyek be rûy dozî kurd le Turkiyeda kirayewe, destpêk ewe bû Turkiye salî 1988 paş hêrişî kîmyabaranî Seddam Huseyn penay 60 hezar penaberî kurdî da. Em penaberane be pêy helûmerc reftaryan legel kira. Le *cengî Kendaw* -da kurd wek hêzêkî dij be Seddam Huseyn ziyatir bûwe cêy serinc lay deselatî xorawa û serok Özal pêşwazî le rêberanî bizavî bergirî kurdî Îraq, le Barzanî û Talebanî, kird. Özal piştîwanî dekirî le çareserêkî federalî bo kurdî Îraq, emeş hîway kurdî Turkiyey bûjandewe, betaybetî leber ewey Özal bûnî 12 milyonî kurdî le Turkiye selimand û qanûnî qedexekirdinî zimanî kurdî pek xist. Partî HEP -î dostekurd saz kira û 22 endamyan be helbijardin hatine parlemanewe. *Partî sosyaldemokratî gel*” SHP ke salî 1991 le hikûmetî hawbeşî demîrel Demirel da beşdar bû, bernameyekî repêş xist be pêşnyazî bercestewe bo selimandinî mafî ferhengîy hawzêdanî kurd. Belam erteş rêy le hikûmet girt û cexitî leser çareserî serbazî dekirî. Kurdîş sûdî lew kiranewey nekird ke le dozekeda xuya bû, beweş derfetî pêşkewtin bem arasteye kujayewe.

Beharî 1993 rêberî PKK agirbestêkî yeklayeney rageyand û beweş derfetêkî niwê hate pêş, begiştî pêşwazî lê kira û bûwe mayey gerimbûnî giftûgo derbarey derfetî kotahênan bew şere xwênawî û dirêjxayene. Belam ew doxe minge têkiçû ewîş be lêdanî karwanêk ke serbazî turkî tédabû le nawçey bengol, serbazekan le moletda bûn û bêçek – 35 serbaz be destî kesanî pergîrî nêw PKK kujran. Cige lewe beharî 1993 serok Özal be kutupir (sekte) -î dil mird û beweş rêy destpêşxerîy niwêy siyasî bo çareserî dozî kurd rêbest bûn çunke pêdeçû Özal تنها kes bûbêt aza û xeyalbaz derwestî em erke hatiba. Ceng çirtir destî pêkirdewe. Ewca take hengaw ke pêdeçû rêy mabêt, selimandinî core otonomîyekî ferhengî bû bo kurd.

Otonomîy ferhengî, goranî û çapemenî be zimanî kurdî, bedem katewe bo kurd selimêndira. Muzîkî kurdî be kasêt û be sîdî be asanî dest dekewêt û stiranbêjî kurdî le Turkiye hewadaryan zore. Govar û kitêb be zimanî kurdî pexş dekirên û be azadî defiroşirên, belam leber ewey kurdî zimanî ciyawazî heye, be gutey Ankara, karêkî siruştîye ke turkî bibête zimanî hawbeşî hemwan bo xwêndinewe. Lêreşda amaje dedirêt be rojnamey “Özgür Politika” ke le Almanya be turkî derdeçêt. Belam çapemenî derbarey mêjûy kurd, nasnamey ferhengî û etnî (nejadî) hêsta her mayey zewtkirdin û dadgayîye, ewîş bepêy rêşagelî asayîşî dewlet le destûrî dijetêrorîda. Êsta kurd bê kosp boy heye cejinî Newroz pîroz bikat, gerçî turk hewil dedat Newroz bitwênêtewe û be nerêtêkî dêrînî turkîy pêşan bidat.

Le buwarî pexşî kurdî le radyo û tîvîda ewa teknîk pêş qanûn kewt: le newedekanewe rojane Med-TV, le London -ewe le rêy setelaytewe bernamey kurdî degeyenête televîzyonî nêw Turkiye (tenanet dîdar legel Apo-y rêberî PKK -da). Paşan Med-TV salî 1995 le Bruksel -îş damezira, delên Med-TV degate 25 milyon bîner. Le mangî marsî 1995 da fermangey tîvîy Brîtanya moletî pexşî le Med-TV standewe be hoy pexşî bernamey wehawe ke diney tundûtîjî dedat. Rexnegirî lîberal delên weha baştîre bo dewletî Turkiye helwêstî nerimtir binîwênêt. Boçî Ankara xoy destpêşxerî nakat? Baştîre xoy pexşî radyo û tîvîy kurdî damezirênêt û bekarî bihênêt bo berjewendîy yekbûn.

Partî Gel SHP y sosyaldemokrat le kongirey 1993 da pêşnyazî kird zimanî kurdî azad bêt hem le xwêndinda û hem le pexşî radyo û tîvîda, belam le hawfermanîda legel partî Çîler, sosyaldemokrat hîç

yek lem xalaney bo neçûwe ser. Herweha Yilmaz -î serwezîranî konewar³² katêk rêberî berhelistkaran bû, le dîdarî xoyda le Amerîka, çareserî lem babetey derdebirî. Ewca be pestanî bazarî Turkiye, ke deyhewêt em cenge giranxercîyey xorhelat bibirêtewe, dûr nîye hikûmet le maweyekî nadûrda astêkî berzî otonomîy ferhengî bo kurdan biselimênêt.

Helbet nasandinî “*nasnamey kurdî*” asan nîye çunke zor kurd heye têkelin legel turk, turkemen, ermen, yonanî û htd. Turk zorin xoyan hem be turk hem be kurd dezanin, zor kurdîş wehaye. Yeşar kemal, be reçekek kurde, be turkî denûsêt, kurdî têdegat belam axaftinî pêy sexte. Öcelan paş hênanewey bo Turkiye raygeyand dayikî turke. Hikûmet zor car delêt çiwaryekî parlemantaran be reçekek kurdin. Tojeran bas le “*firenasname*” *multiple identity* û takî fireferheng deken. Tojeran delên leber ewey takî firereçekek le seranserî Turkiyeda hen – Turkiye 49 grûpî etinî heye! – karêkî siruştîye ger civakî fireferhengî geşe bikat û ferhengî etinî ciyawaz geşe bikat û giştîyan wêkra hel biken. Em debête hander bo pêşkewtinî “*nasnamey kurdî*”.

Hikûmetî Turkiye dozî kurd legel kê bixate berbas? Ankara delêt: legel hîç kes, leber ewey şitêk nîye be nawî dozî kurd. Tenanet ewaney deşilên dozî kurd bûnî heye, zorbeyan layengirî ewen ke Ankara nabêt ew base legel sazimanêkî kurdîda bixate giftûgowe belkû debêt le nêw dezgey deselatda, wate le parlemanda, çare bikat. Deysa eme çon dekirêt katêk parlemantarî kurd parêzdarî (“*immunity*”) lê zewt dekirêt û dexirête zîndanewe? Wek ewey Leyla Zana û şeş parlemantarî dîkey DEP³³ mangî marsî 1994, tawanbar kiran bewey xelkiyan han dawê bo dabiranxwazî wate bo şikandinî yekbûnî xakî Turkiye, beweş destûrî welatyan bezandûwe. Parte kurddosteke qedexe nekirawe, belam Ankara delêt kurd le gişt partêkî siyasîda heye leber ewe pêwîst nakat partêkî taybet bête damezirandin û bibête xawenî ew doze. Cêy amajeye bilêyn partî destekurdî HADEP³⁴ -î cêgirewey DEP le helbijardinî salî 1995 da le ser astî mîllî tenha 4 le sedî dengî hêna gerçî le çend herêmêkî xorhelatda rêjey beriz bû. Eme pêşanî dedat ke ew kurde zorey le xoraway Turkiye niştêcên le buwarî siyasetî partayetîda nayhewêt kurdane bête nasîn.

Zor kes pirsyar deken bo kurd û parlemantarî partî destekurd pêgey xoyan baştir bekar nahênin bo pêşxistinî dozî kurd? Lebirî wirûjandinî parleman be milnedan bo swênd xwardin û milnedan bo gutarbêjî be zimanî turkî, xo detwanin be giftûgoy nerim mitmaney hawkaranyan rabikêşin. Le welamda degutirêt hoy reftarî parlemantarnî kurd eweye deyanhewêt demudest helwêstî xoyan bo mîllet rûn bikenewe, serinc bo dozî kurd rabikêşin û bo dengderanî biselimênin ke peymanşkênîyan nekirdûwe.

Turkiya salî 1987 “*doxî nalebar*” -î le 10 deverda rageyand (serleberî welateke 67 devere) û hemû çiwar mang carêk ew biryare niwê dekatewe. Beweş deşêt gişt prinsîpêkî selimêndirawî mafî mirov le layen dewletewe perawêz bixirêt û sazimangeli mafî mirov le Turkiye delên dewlet mafî nîye ew kare bikat. Dewlet cexit dekat Leser ewey “*mafî jîyan yekem prinsîpe le mafî mirovda û em mafe le layen PKK -ey têrorîstewe rêzî lê nagîrît*”. Leber eweye dewlet debêt tundûtîjî bekar bihênêt bo ewey jîyanî hawzêdanî xoy biparêzêt. Sîstemî “*gundparêzan*”³⁵ eweye ke hikûmet çek û pare dedate kesanî helbijarde, zorbeyan serxêlî kurdin, bo parastinî gundekan le hêrişî PKK. Jimarey “*gundparêzan*” le seretay newedekanda be 60 hezar kes mezende dekira. Çendîn serxêlî hêzî çekdarîy xoy pêkewe na,

³² Konewar: parêzgar, konesêrvatîv, *Conservative*.

³³ Partiya Demokrasiyê: be turkî DEP - Demokrasi Partisi - salî 1993 hate dameziran wek cêgirêkî Partiya Kedêya Gel - be turkî HEP - Halkın Emek Partisi - ke salî 1990 hate dameziran.

³⁴ Partiya Demokrasiya Gel be turkî HADEP - Halkın Demokrasi Partisi salî 1994 hate dameziran.

³⁵ Gundparêz: ew kurdanen ke legel dewletî turkiyan û dij be PKK decengin. Ewey le nêw kurdda pêyan degutirêt *çaş*.

bo nimûne xêlî Bucak ke delên ziyadtir le 10 hezar çekdarî heye. Lemane çekêkî zor radestî PKK dekirêt, ca be xoşî bêt yan be zor. Bazirganîy çek û narkotîka diyardeyekî degmen nîye. Çendîn “gundparêz” be xêzanîşewe lem buwareda giyanyan ledest da.

Zor kes heye pêy waye xofermanîyekî helkişîw le rêy sîstemêkî nêwendpert³⁶ (namerkizî) ewe bo Turkiye başe. Emane delên le serdemî Ataturk -ewe deselat tenha le Ankarada çir dekirêtewe, emeş kospe le rêy dêmokrasîda, nêwendpertandinî deselat debête rêçkeyek bo xofermanîyekî firewantir bo kurd.

Hikûmet delêt têrorîzim hokarî ew nehamtîye civakî û abûrîyey başûrî xorhelate. Leber eweş basî “lêburdin” (amnestî) û sermayeguzarîy abûrî bo geşekirdinî nawçeke ret dekatewe. Hemû handanêkî bazar bo kar lew nawçeyeda welam dedirêtewe bewey carê debêt asayîş damezirêt ewca bazar detwanêt sermaye bihênête nawçekewe. Sazimanekanî bazarkarî lemêje delên abûrî, siyaset û bazarî Turkiye pêwîstyan be rêforme. Sazimanî behêzî *TÜSIAD* ke hem sendyakî xawenkarane û hem sendîkay pîşesazîye, lemêje rexne le hikûmet degirêt bewey şikestî hênawe le zemînesazîy bo firajûtinî abûrî û civakî le nawçey başûrî xorhelat.

Îshaq Altûn, ke yekêke le kompanyardare nawdarekan, le dîdarêkî serincrakêşî tîvîda, paş girtinî Öcalan, daway le hikûmet kird, bo geşekirdinî xorhelatî Turkiye tenha cexit le ser pare û hêzî fizîkî nekat, belkû derfetîş bidate gelfî kurd azadane nasnamey ferhengîy xoy biniwênêt. Be dîdî Altûn, hewildan bo firajûtinî xorhelatî Turkiye ger hawkat rêformî siyasî letek nebêt, karêkî mayepûçe. Serincî lem babete xerîke wîrdewirde demparêzane le mêdyay Turkiyeda ser heldeden.

Dozî kurd le henderan

Biryardan leser jimarey kurd le xoraway Ewrûpa -da karêkî sexte çunke kurd wek koçberî welatî Turkiye, Îraq yan Êran tomarnûsin nek wek kurd. Tojerêkî Yekîyetîy Ewrûpa (EU) heye delêt jimarey kurd le xoraway Ewrûpa -da be 500 hezar mezende dekirêt û bem şêweye dabeşin:

- 300 hezar le Almanya (le şarî bon Bonn boçûn heye delêt kurdî Almanya nêzîkey 500 hezare)
- 60 hezar le Fransa
- 30-40 hezar le Holand
- 20-30 hezar le Utirîş (Nemsa)
- 20 hezar le Êngland
- 15-20 hezar le Swîsre
- nêzîke 18 hezar le Swêd
- nêzîkey 13 hezar le Danmark
- 10 hezar le Beljîk
- 2 hezar le Fînland

Leweş bitirazêt nêzîkey 400 hezar kurd le Rûsya nîşteçên. Serçawey swêdî delên ziyadtir le 100 hezar kurd le Swêd heye û zorîneyan kurdî Îraq û Êran -in.

Her lew demewe ke “*Kurdistan*” -î yekem rojnamey kurdî salî 1898 le Qahîre pexş kira, tarawge sengêkî gewrey peyda kirdûwe bo ziman û ferhengî kurdî. Kitêb û govarî kurdî ke rêy çap û pexşîyan

³⁶ Nêwendpert: *Decentralized*. Nêwendpertandin: *Decentralization*. Nêwendgîr: *Centralized* û nêwendgîrandin: *Centralization*.

nebû le nawçey kurdîda, le derewe le layen rewendî kurdewe saz dekiran. Wêray kospî siyasî le rêy pêkhênanî zimanêkî edebî yekgirtûda kêşey dîkeş heye, kurdî Îraq û Êran zimanî xoyan, “*sorani*”, be pîtî erebî denûsin, belam kurdî Turkiye û sûrya zimanî xoyan, “*kurmançî*”, be pîtî latînî denûsin û kurdî kone Sovyet be pîtî kirîlîk.

Salî 1996 “*Kitêbixaney Kurdî*” - “*Kurdiska Biblioteket*” le şarî Stockholm hate dameziran be mebestî penadanî ferhengî kurdî û terxankirdinî buwarêkî awale bo hemûwan. Kitêbixaneke ziyadtir le 3 hezar kitêbî heye cige le rojname, govar, muzîk û filimî vîdyo be nawerokî kurdîyewe. Kurd delên le Swêd sedan nûserî kurd heye, nêzîkey 50 weşanxane û şêst govar û rojnamey lêye, boye delên “*Stockholm paytextî edebîy zimanî kurdîye*”.

Welatanî tarawge, bepêçewaney wîstî xoyan, pelkêş kirawinete dozî kurdewe, leber eweşe belayenewe girînge hawkar bin le dozînewey çareserda. Le dîdarekey rojnamey *Dagens Nyheter* -da Öcelan gutî welatanî bakûrî Ewrûpa, wek Swêd û Norwêj, detwanin şanoreyan hebêt le dozînewey çareser bo dozî kurd çünke gîrodey berjewendî taybetî xoyan nîn le nawçekeda. Belam Turkiye hemû basêk lem buwareda ret dekatewe goya dest têwerdane le karûbarî nêwxoy ewda. Turkiya amade nîye beşdar bêt le hîç civînêkî firemîllîda ke taybet bêt be giftûgo le dozî kurd, bo nimûne konferensî Oslo sêptemberî 1995. Leber ewe her rêçkey “*mafî mirov*” mawe, lewêda dekirêt turk wek endamêkî Encumenî Ewrûpa (*Council of Europe*), sazimanî OSCE,³⁷ yekîyetîy gumirg, EU û htd, rûberûy berpirsayetî bikirêtewe.

Le encumenî firemîllîda her pêşnyazêk bixirête berbas yekem xal têyda birîtîye le agirbest. Agirbest, ger le sayey çawdêrîy firemîllîda piyade bikirêt – ke le rwangey Turkiye -we cêy selimandin nîye - zor car, be mebestî xoşkirdinî zemîne bo çarey siyasî, têhelkêş debêt legel mafî sazimangerî û derbirîn le Turkiyeda, ke PKK -eş degirêtewe. Raportî ESC³⁸ le novemberî 1994 da pêşnyazî weha bû gişt partêkî laşer (natundûtîj) derfetî hebêt bo beşdarî le guzeranî siyasîy Turkiyeda. Helbete nehêştinî sistemî “*gundparêzan*” û “*doxî nalebar*” beşêkin le pêşnyazêke, herweha selimandinî otonomî ferhengîy bo kurd. Partî sosyalîstî Kurdistan -îş çend xalêkî ew pêşnyazey repêş xist. Em parte mêtudî tundûtîjî PKK ret dekatewe û herweha beşdarbûnîşî le parlemanî kurdîy henderanda ret kirdewe be biyanûy ewey fermanî bedest PKK -eweye.

Ew turk û kurdaney beşdar debin le civînî firemîllîda derbarey dozî kurd, delên Turkiye boy nîye welatanî dîke tawanbar bikat be dest têwerdan le karûbarî nêwxoy Turkiyeda, çünke ger Turkiye rê daba karûbarî weha le nêw Turkiyeda azadane bête giftûgo ewsa hîç pêwîstîyek nedema bo dest têwerdanî derekî.

Tojeran pêyan waye kat legel dozînewey çareserdaye. Le Îstenbûl salî 1995 bîstim deyangut lewaneye dû sê salî dîke bixayenêt. Katêk em dêrane denûsirênewe xerîke pênc salêk têper debêt bê ewey çareser diyar bêt. Lewaneye gîranekey Öcelan derwazeyek bikatewe, bew corey Ankara reçawî girtwe, belam eweş daway wîstî siyasî, bîrî siyasîy niwê û azayetî dekat bo ewey em nakokîye çareser bêt ke çendîn sale Turkiyey goc kirdûwe û peywendîyekanî legel hem derawsê û hem EU da alozkandûwe.

Welatanî derewe dawa le kurdî gişt grûpe ciyawazekan deken hewilekanî xoyan yek bixen, bo ewey ger giftûgoyek le encamî gîranekey Öcelan -da hate kayewe, eman xawen niwêneranêk bin behêz û cêbawer. Pestanî derewey welat be girîng dezanrêt belam lewaneyîşe bibête hoy wirûjandinî bertekî

³⁷ Sazimanî asayîş û hawkarî le Ewrûpa: *Organization for Security and Co-operation in Europe – OSCE*.

³⁸ Economic and Social Council – ESC.

nasyonalîstane le Ankara. Legel eweşda em derhawîştaye be katekî dezanrêt ger berawird bikirêt
bew mebeste dirêjmewdayey zorbey turk heyetî bo nêzîkbûnewe le Ewrûpa.

«...»

Gutarî dûhem

Dozî Mûsil û “wam” -ekey Swêd³⁹

Dozî Mûsil⁴⁰ û “wam” -ekey Swêd

Diyarîkirdinî sinûrî nêwan Turkiye û Îraq bûwe kêşeyekî gewre û nekira le “peymannamey Lausanne” (*Treaty of Lausanne*) da çare ser bikirêt leber ewe arastey “Komkarî Dewletan” (League of Nations) kira û emîş çend nawbijîwanêkî nawzed kird, yek lewan Hjalmar Branting⁴¹ bû. Demewe destpêkî em kare, le mangî august -î 1924 da, Gustaf Wallenberg, nameyek bo Branting denûsêt – paş nameyekî supasguzaraney Branting bo ew raportey pêy geyîşt derbarey sengî “peymannamey Lausanne” bo Swêd – têyda Wallenberg dîdî xoy derbarey “Dozî Mûsil” rûn dekatewe. Em nameye deba “kesekî û razpoşiraw” bêt, boye le dusêyekanda dest nedekewt – min kopîyekim le erşîvî kesekîy Wallenberg da dozîyewe.

Destpêkî nameke delêt: “*Biram Hjalmar Branting*” û huşyarî dedat “*Brîtanya gişt twanay xoy dexate ger bo tolesendindewey encamî konferensî Lausanne*”. Be dîdî Wallenberg, xebatî Brîtanya bo dabînkirdinî rêgey Hîndistan (Hîndustan):

Dilnyam arastey Turkiye dekirêt, çunke pasewanîy ew le derbend, rûsya behêz dekat. Min demhewêt to zor baş eme derik bikeyt û gişt twana û pirêstîj (seng, heybet) -î xot bixeyte pal serxistinî berjewendîy komarî Turkiyeyewe ke weha zîrekane xebat dekat bo manewey xoy û deşkatewe berjewendîy welatekey toyîş, çunke asûdeyî û aramîy welateket bende be pek xistinî koşesî Brîtanya bo têkdanî ew çirbûnewe Ewrasya (Ewrûpa-Asya) -yey lay başûr, ke bo ême zor girînge. Leber ewe siyasetî “ême” debêt hem dosterûs bêt, hem dosteturk; erkî “to” eweye be tundî dakokî bikeyt le daxwazîy reway mîlletanî biçûk ke be aramî derfetî geşekirdinyan hebêt.

Helbet aşkiraye bo Gustaf Wallenberg neywîstûwe em amojgarîyane bikewine berçawî wezaretî henderanî Swêd û lewîşe lewaneye bigate dest balwêzyan le London. Lêman diyar nîye pêşwazîy Branting lem amojgarîyane çon bû - min hîç welamêkî em nameyem bo nedorzayewe.

³⁹ Serçawe: Kaj Falkman. *Mosulfrågan och den svenska “skulden”.* Turkiet - Gränsfursten: utsikter från Svenska palatset i Istanbul. Atlantis 1999.

⁴⁰ *Dozî Mûsil*: wate dozî dabirînî başûrî Kurdistan (ew deme pêy degutira Wîlayetî Mûsil) le turkiye û likandinî be Îraq -î Brîtanya -we. Be rûnî dekatewe cudakirdinewey başûr le bakûrî Kurdistan.

⁴¹ Hjalmar Branting (1860-1925) rojnamewan û siyasetmedarî nawdarî Swêd e. Birantîng salanî 1887–1917 sernûserî rojnamey *Social-Demokraten* bû, maweyek (1917–18) wezîrî darayî û paşan 1920 bûwe serwezîranî yekem hikûmetî sosyaldemokrat le Swêd. Serçawe: *Nationalencyklopedin*.

Belam rewî em doze le nûsirawêkî serincrakêş û seyrda rûn debêtewe ke Paul Mohn⁴² le 24- jûn-1928 le Îstenbûlewe arastey Eliel Löfgren⁴³ -î wezîrî henderanî Swêdî kirdûwe. Lew nameyeda basî axaftinêkî dirêjxayentir hatûwe legel Tewfîq Ruşdî (Tevfik Rüştü)⁴⁴ wezîrî henderanî Turkiye derbarey “Dozî Mûsil” û kardanewey ew doze Leser peywendîy turkî - swêdî.

Paul Mohn -î kurî pastorî fransî le Stockholm, dîplomatêkî cewanî swêdî bû, cige le zanîn çendîn ziman, zor baş şarezay karûbarî Turkiye bû çunke salî 1917 karmendî balwêzxaney Swêd bûwe le Îstenbûl û paşan 1926-28 karmend bûwe le niwênerayetîy turkî le Stockholm.

Paul Mohn - le kitêbekey xoyda be nawî “*Geştêk bo Afxanistan*”⁴⁵ basî kirdûwe - be erkî ferimî deçête Afxanistan, le rê be piştîwanîy wezîrî turkî le Stockholm⁴⁶ û herweha Wallenberg -î “*balyozî rasparde*”⁴⁷ (*Envoy*), derfetî diraye seredanî wezîrî henderanî Turkiye bikat be mebestî wergirtinî rêniwênî û nasînî dîdî Turkiye derbarey barûdoxî Afxanistan û herweha bo wedesthênanî piştîwanîy Turkiye bo em erkey xoy. Lebîrî ewe Mohn raportêkî wirdî wergirt derbarey dîdî seranî dewletî Turkiye beranber Swêd.

Leber ewey “Dozî Mûsil”, ke birîtî bû le diyarîkirdinî sinûrî nêwan Turkiye û Îraq, le peymannamey Lausanne -da çareser nekira, be vekirî mayewe bo ewey le bênewberey nêwan Brîtanya - ew deme Îraq le jêr mandatî Brîtanyada bû - û Turkiyeda biryarî bidirêt. Biryarîş bû ger le mawey no mangda bênewberey nêwanyan negate pêkhatin, ewsa em doze dedirête encumenî “*Komkarî Dewletan*”. Herwehaş bû çunke hîç layenêkî em nakokîye aloze amadey sazş nebû. Turk pêy wehabû wîlayetî pirnewtî Mûsil malî xoyane û pêşnyazî gelpirsîyan kird, înglîzîş cige le berjewendîy newt, berjewendîy stratîjî serbazîy hebû leweda ke rêgeyekî awaley hebêt bo Hîndistan boye deynawîst rê le Turkiye bigirin sûd le wîlayetî Mûsil werbigirin bo pelamardanî Bexda û kendawî fars.

“Komkarî dewletan” Hjalmar Branting -î nawzed kird be raportidar û paş mirdinî Branting salî 1925, Östen Undén⁴⁸ ew erkey “be mîrat” bo mayewe. Lîjneyekî peycor⁴⁹ -î le sê endam, yek swêdî, yek beljîkî û yek hengarî, be demrastîy Einar af Wirsén hate dameziran. Em lîjneye geyişte ew encamey ke xelkî em wîlayete çî dilgerimîyekîyan, ne bo fermanarî turk û ne bo Brîtanya, nebû. Kurd, ke letek turk û erebda, pêkhatay em wîlayete bûn û têyda zorîneş bûn, daway xofermanyay dekirde. Legel eweşda em lîjneye pêşnyazî kird ke wîlayetî Mûsil bo mawey 25 sal bixirête jêr mandatî Îraqewe ke xoy le jêr mandatî Brîtanya bû - belgey af Wirsén lemeda birîtî bû lewey xelk brîtaniyekanî be “*the less of two evils*” (*le herdûkda emyan kemtir bede*) dadena. Encumenî “Komkarî Dewletan” encamgîrîyekey em lîjneyey selimand, bew mercey ger Îraq, ber le tewawbûnî ew 25 saley mandate,

⁴² Paul Mohn (1898-1957) dîplomatêkî swêdîye û nawdare bewey xawen bîrokey projeyekî nayab bû bo harîkarî welatanî hejar be nawî “*Mohnplanen*” (*Planî Mon*) û birîtî bû le terxankirdinî derfetî xwêndin le Swêd bo hezaran fêrxwazî welate hejarekan. Serçawe: Carolina Söderholm le govarî *Populär Historia*, birwane www.popularhistoria.se.

⁴³ Eliel Löfgren (1872-1940) dadnas û siyasetmedarêkî lîberalî swêdîye, le nêwan 1917-20 wezîrî dad û le nêwan 1926-28 wezîrî henderan bûwe. Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

⁴⁴ Tewfîq Ruşdî Aras (Tevfik Rüştü Aras) (1883-1972) siyasetmedar û dîplomatêkî nawdarî turke.

⁴⁵ Paul Mohn. *Resa till Afghanistan* (1930).

⁴⁶ Wate balyozî turkî le Stockholm.

⁴⁷ Balyozî rasparde: *Envoy*, kesêke xawen pêgeyekî dîplomasîy beriz giftûgoy taybet degirête esto.

⁴⁸ Östen Undén (1886-1974) dadnas û siyasetmedar (sosyaldemokrat) -î swêdîye, le salanî 1924-26 wezîrî henderanî Swêd bûwe.

⁴⁹ Peycorî: lêkolînewe le basêk. Peycor kesêke bêhewêt pey berêt be basêk û dîvçûnî lê bikat.

serxobûnê wergirt, ewsa dozî wîlayetî Mûsil dîsan bixirêtewe berbas. Cige leweş gelî kurd deba “*mafi kemînayetî*” (!) pê bidrêt. Salî 1926 Turkiye nabadil biryarî “Komkarî Dewletan”î selimand.

Tewfîq Ruşdî-î wezîrî henderan bo Paul Mohn y rûn kirdewe ke norey Undén -î wezîrî pêşûy henderanî Swêd, le çareserî em kêşeyeda, zor baş nebû:

Hander le pişt helwêstî raportidarî swêdiyewe başî pê nagutirêt. Swêd ewdeme hewilî deda – herweha paşaniş – destî hebêt le siyasetî cîhanîda û cige leweş daway zalbûn (hejemun, Hegemony) dekat le bakûrî Ewrûpa -da. Kewate tawanî Undén lewedaye - be îlhamî London na belam be îlhamî Briand⁵⁰ - “Dozî Mûsil” -î dûwa xist bew amancey Almanya bihênête Locarno⁵¹- we. Weha danira bû Turkiye bikirête qurbanî [...] hele leweda bû rê bidrêt encumen biryarî dozeke bidat. Undén deba her le seretay karewe herdû layenî ko kirdibayewe bo sewda û pêk hatin. Kar bem şêweye nekirêt, her bew core debêt ke bû. Belam bênewberey Turkiye û Îngland derbarey Mûsil paš ewey goya çaresere bo kêşeke, be rûnî pêşanî dedat ke tenanet Undén îş deba derencamî baştirî wedest hênaba.

Heta êre gutey Ruşdîye le ziman Mohn ewe. Le rastîda şandekey Undén paš tawûtwekirdinêki wird pêşnyazêkiyan pêşkeş kird bû ziyadtir mercekanî Turkiyey reçaw degirt. Belam Îngland -î zilhez twanîbûy zorîne wedest bihênêt le encumenda bo berjewendî xoy û Îraq. Biryar deba hawdeng bêt, beweş doxêki bêçare peyda debû. Bo ewey nebine rêbest le ast çareserî kêşekeda, kemîne wate Swêd û dû welatî dîke, biryaryan da le dengdanî kotada dengî xoyan xamoş biken. Turkiya biryarekey encumenî neselimand û beweş rîskî tîjbûnewey nakokîyeke hate kayewe. Belam le salanî paşîda herdû la bênewberey tazeyan dest pêkirdewe û be wirdegorankarîyek le biryarekey encumenda geyîştine encamêki aştewa.

Gerçî Östen Undén wek raportidarêk le nêw sazimanêki firemîllîda ew erkey helsûrand, wezîrî henderanî turkî pêy weha bû hewilekanî em le rûy siyasîyewe bûwe mayey:

Le nêwan Turkiye û Swêd -da konto (hîsab) yekî paknekirawe heye. Lewaneye Undén pêy weha bûbêt “Dozî Mûsil” zor zû lebîran deçêtewe, belam ewe heleyekî gewreye. Turkiya rê be xoy nadat babetî wehay lebîr biçêtewe. Karî weha debûwe nîşaney lawazî. Ew wam (qerz) -ey peyda bûwe û êsteş her heye - û le berdewamîy axaftinda hest dekira birî em wame êsta helkişîwe - debêt qerebû bikirêtewe, rêk bepêy ew prinsîpaney bûnete rênimûy siyasetî turkî. Kewate sendinewey em wamey Swêd serçawe le dujminayetîy Swêdewe nagirêt, belkû derhawîştetekî tewaw lojîkaneye le siyasetî Turkîye.

Le berdewamîy axaftinda wezîrî henderanî turkî pêşanî dedat ke gute û mebestî yek degirnewe:

⁵⁰ Siyasetmedarî fransî Aristide Briand (1862-1932) le 1909-29 yazde car serwezîran bûwe. Destpêk dadnas û paşan le seretay 1890 -ekane we rojnamewan bûwe, legel Jaurès -da rojnamey L'Humanité -y sosyalîstane y damezirand.

⁵¹ Peymanî Locarno (*Locarno Treaties*) salî 1925 le Swîsira bestira bo pêk hatin û diyarîkirdinî sinûrî nêwan Almanya û Fransa-Beljîk û herweha çekdamalînî nawçey Rayn. Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

Carî dahatû ger kêşeyek le nêwan Stockholm û Mosko -da serî helda, ême destbecê layengirî Mosko debîn û gişt destroyîman dexeyne xizmet Rûsya-we. Ewsa îdî hisabîman rêk debêtewe û gişt barêk wek caranî lê dêtewe.

Mohn denûsêt wezîrî henderan lem buwareda rûnî kirdote ke agadare lewey nakokîyek berêweye le nêwan Fînland û Rûsya -da û lewaneye Swêd -îş bigirêtewe. Leweş bitirazêt carêkî dîke hergîz swêdî nabête nawbijîwan û pêkhêner le kêşey nêwan Turkiye û deselatî dîkeda. Ewsa danmarkî, holandî, swîsirî û htd werdegîrên.

Hîç layenêkî em helsengandine tunde bo peywendî nêwan Turkiye û Swêd le raportekanî Gustaf Wallenberg bedyar nakewin. Lewê norey Undén le “Dozî Mûsil” da tenha labela basî dêt. Lewaneye Wallenberg neywîstbêt ewey bîstûyetî gewretirî bikat yan lewaneye ew heman ew zanyarîye patewpat (aşkîra) ey pê negeyîştî wek Mohn -î rêbuwar. Mohn delêt wezîrî henderanî Turkiye raygeyandûwe ke girîngîy Swêd bo Turkiye tenha eweye wezîrî turkî le Stockholm dilgermane basî welatekeman bikat û herweha kesayetîy Wallenberg -î “balyozî rasparde”.

Tewfîq Ruşdî peywendîyekey xiste bestênêkî berîntirewe: tenha ewe nîye Turkiye bûbête dewletêkî niwê, bigire turkîş bûnete mirovî niwê. Hiziryan ewende gorawe, tenanet bo xoşyan sexte xoyan binasinewe:

Caran Turkiye be boney lawazîy xoyewe kala bû, topêkî geman bû le siyasetî deselatdarnî dîkeda. Êsta çarenûsî xoy girtote dest û hêzî xoy deniwênêt [...] Leber ewe hemû kêşeyekî siyasî û gişt nakokîyekî feremîllî bo Turkiye debête derfetêk bo xopêşandan. Emeye serçawey nawdarbûnî turk bewey le bênewbereda sersext û cîrin. Turkiya bebê qerebû, destberdarî hîç babetêk nabêt [...] Turkiya le kêşey siyasîda yek înc le pirsînîpî beraberî û sizadan lanadat.

Sizadan û qerebû. Em core bîrkirdineweye le buwarî peywendîy firemîllîda begîştî degmen nîye, belam le siyasetîy henderanî turkîda berdewam amadeye. Lem rojgarey êstada Turkiye hest dekat Yekîyetîy Ewrûpa be corêkî nadirust helsûkewtî legel dekat, bewe ranawestê ke destî dostayetî bo cîhanî îslam yan bo Amerîka dirêj dekat, belkû bîr le dijereftarîş dekatewe bo hawsengkirdinewey terazû. Katêk dîdarî serokayetîy EU dêsemerî 1997 le Luksemburg Turkiyey nexiste lîstî welatanî nawzed bo endametî, Turkiye destbecê welamî dayewe bewey rû bikate Amerîka bo kirînî beşêkî girîngî firokekanî xoy. Katêk Îtalya rêgey da be Öcelan bête welatekeyewe û radestî Turkiyey nekirdewe, Turkiye be rêbestî bazirgarnî welamî dayewe. Gerçî Îtalya girîngtirîn hawbazarî Turkiyeye û le hemwanîş gerimtîr le EU da piştîwanîy le Turkiye kirdûwe. Eme pêşanî dedat çon le nakaw prinsîpî sizadan zal dekirêt beser berjewendîy dirêjmewday bazirganî û siyasîda.

«...»

Gutarî sêhem

Terceme û lêkdanewe⁵²

Terceme û lêkdanewe

Umberto Eco⁵³ le kitêbî: *Mouse or Rat? Translation as Negotiation* (Weidenfeld & Nicolson, London 2003) da delêt “Tercemekirdin” wate giftûgo. Leweşda mebestî eweye terceme cige le bayexdan be hokarî lêksîkal (wişesazî), sîntaks (ristesazî) û sêmantîk (watanasî) y têkst, debêt rêkarî ferhengî û civaknasîş reçaw bigirêt. Berhemî kota debête derencamî çendîn giftûgoy ciyawaz le astî ciyawazda û çawerêş dekirêt letek têkstî serçaweda hawşan derçêt. Le proseyc terceda car heye parçeyek ziyad dekat, wela denrêt, dête gorîn, alişt dekirêt⁵⁴ û dêtewe dariştin. Wate tercuman herçendêk be babetekey xoyewe xerîk bêt, berhemî kota herdem şitêk derdeçêt ciyawaz le berhemî bincî. Leber eweyişe terceme debêt tenha wek bijarey⁵⁵ lêkdanewey berheme bincîyeke seyr bikirêt.

Amanc le gişt tercemeyek dekatewe ewperî nêzîkbûnewe le binceberhem. Geştiştin bew nêzîkîye, yan her nebêt hawşanîye, karêkî weha hasan nîye. Katêk ziman kurtî dehênêt, leber ewey wişey beranber le zimanî dûhemda peyda nîye yan heye belam watay ciyawaze, tercuman naçarî giftûgo debêt be destawêjî dîke bo geştiştin be watay mebest.

Delên dîplomasî dekatewe giftûgo. Dîplomat debêt derbarey gişt dozêk giftûgo legel henderanda bikat. Zorbey car kêşe tenha pêk hatin nîye leser helbijardinî wişe belkû pey birdine be watay wişe le rwangey ferhengî û civaknasîy ciyawazewe.

Mawey salêk le *konferensî asayiş û harîkarîy ewrûpîda* le Jenêv min beşdarî giftûgo bûm derbarey peyv û watay peyv. Giftûgo yekcar wirdekarane bûn, tenanet koma (wêrgul) dananêk axaftinî tundî lê berpa debû. Helbet sextîy giftûgoy Jenêv nakokîy aydyolojîyan le pişt bû. Peyvî wek “azadî” le Ewrûpay xorawa û Ewrûpay xorhelat watay ciyawazyan hebû, ewca le nêw şandî bilokî rojhelatîşda wirdecyawazî hebû - bo nimûne lêkdanewey dîplomate polonîyekan pitir xizme xorawa bû nek Sovyet. Ême lem giftûgoyaneda têgeyîştîn ciyawazîy nîwan welatanî Ewrûpay xorhelat çone û peywendîyan le nêw xoyanda û legel Sovyet -îşda çone.

⁵² Serçawe: Kaj Falkman. Tolka och översätta.

Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati. Carlsson 2008.

⁵³ Nûser û feylesûfî ferhengnasî îtalî Umberto Eco (1932-) yekêke le sîma here nawardekanî ferhengî îtalîy hawçerx. Eco xawenî çendîn berheme derbarey estetîk (ciwanînasî, *aesthetics*) û mêjûy ferhengîy serdemî navîn û herweha derbarey şewazî derbirînî wêjekarî, bo nimûne şewekarî û film, betaybetî le buwarî ferhengî gelêr û danûstanî gelêr-da. Eco le salî 1971 ewe le Bologna y Îtalya profîsorî Semiotic-e (Semiotic: bîrdozey felsefî derbarey karkirdî hêma û amaje).

Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

⁵⁴ Ger “gorîn” bo *Change* bêt, lewaneye “alişt” bo *Replace* xirap nebêt. “Dariştinewe” beranber *Paraphrase* bekarhatûwe.

⁵⁵ Bijare: bedîl, elternatîv, *Alternative*.

Katêk ciyawazîy aydyolojî wişe rengirêj dekat, mirov her ewendey bese aşinay ew rûpoşe bê, îdî be hasanî le wişeke degat. Belam ger wişe rîşey le jiyarî wehada bû mirov têyanda nejyabêt, pêwîstî be tojînewey berfirewan debêt heta jêderyan binasêt.

Le dû kesî ser be dû mîlletî ciyawazim pirsî: be çi zimanêk legel yek dedûwên? Gutyan: be înglîzîyekî şikeste. Zorbey giftûgoy cîhanîş her wehan: be înglîzîyekî şikeste rewî deken. Zimanî înglîzî geyişte ewey zimanî êspêranto hergîz pêy negeyişt, destawêjêk bo danûstanî cîhanî, destawêjêkî xawen şawîşe belam bê nawerokî bala. Gişt ewaney zimanî înglîzîyan zimanî zigmake xawen baladestîyekî firemîllîn nabêt bekem bigîrêt. Ewanin le sazimanî firemîllîda bûnete xawen destpêşxerîy dariştin û pêşemîy lêkdanewe. Ewan zimanî xoyan tirincanote nêw hemû teknîkî hawçerxî danûstanewe. Cîhanfermanîy fizîkiyan gora be cîhansalarîyekî hizirî.

Deysa dîplomatêkî serbe zimanistanêkî biçûkî wek swêdî çon detwanêt lem zimansalarîye birewstêneda cêy xoy bikatewe? Debêt ewende baş şarezay ew destawêje bê têyda bibête ustad. Xo tercemekirdin bemebestî hawşanbûn legel ewanî baladestda ne dekirêt û ne cêy handane.

Zimanî xoman, xaney xomane û her wehaş debêt. Be regûrîşe û jêderekanî xoy hêzêk be ême debexşêt ke paşan zimanî tazey zadey fêrbûn natwanêt bibexşêt. Heta zanistiman qûltir bê derbarey wişey xoman û bestênyan, asantir detwanîn bestênî zimanistanekanî dîke derik bikeyn. Beweş erkî dîplomat ke giftûgoye hem xoştir debêt û hem pitir hasan.

«...»

Gutarî çiwarem

Hemekar û taybetkar⁵⁶

Hemekar û taybetkar

Zor car ger degutirêt dîplomat kesêkî hemekareye, mirov pêy waye dîplomat kesêkî *amatwêr* (amateur) (napîşewer) -e. Wate gişt kesêk detwanêt bibête balyoz (sefir). Belam ew hemekare le xwêndinî çendîn saley pîşey dîplomasîda taybetkarîyek fêr debêt kesêkî derekî nayzanê: taybetkarîy pîşey dîplomasî.

Kesanî dîplomat zanyar peyda deken derbarey çendîn babet û çendîn welat. Fire car seyrim lê hatûwe beşêkî çend kem lew zanyare dête bekarhênan û xelkî pêy dezanin. Dilnyam lewey hezaran raportî min le erşîvda danirawin, le layen kem kesewe xwêndirawinetewe û kemtirîş bekar bûn. Hemû dîplomatêk dezanêt ke berhemî jiyani xoy erşîvbende - û zor carîş her erşîvbendîy bo demênêtewe.

Belam ewey konedîplomat bîryan lê dekatewe ew raportgele nîn, belkû yadewerîy hemû dîdar û şwênêkî namon. Emaneyîş begîştî dekewine derewey erkî pîşeke û wek xalî here taybetî jiyani direxşanin, deşêt dastanyan bo kesanî dîke bigêrîtewe, belam kem kes twanay heye ew yadgarane le barêkî wêjekarda darêjêtewe.

Rojêk le Stockholm le otobûsda tûşî xanimêk hatim, le mêj bû xanenşîn bû, zûtir le wezaretî henderan [î Swêd] wek “xanimî taypîst” karî dekird. Xanim gutî: “Seyr nîye twanay taypkirdin be dezgey tayp (Typewriter) derfetî dabim cîhan bibînim!”.

Em xanime yekêk bû lew taybetkaraney nêw fermangey henderan. Taybetkarêkî zor pêwîst bo kesanî dîplomat çunke xoyan hunerî taypiyan nedezanî. Ewan hemekare bûn û pêwîstyan bewe nebû xoyan be teknîkkarîyewe xerîk biken.

Wêray gişt basêk derbarey hemekarbûnî dîplomat mirov her zû boy derdekewêt ke taybetkarîy le korî dîplomasîda ser heldedat. Her çend salêk paş destpêkî kar dîplomat le pîşekeya rêçkey taybet degirê: karmendî dozî siyasî, dozî bazar, abûrî, komek, ferheng, mêdya, agadarî, kargêrî û ... htd. Belam hemû taybetkarêk debêt hemîşe amade bêt erkî dîke bigirête esto. Em herdem amadebûneye bo hatine dest le buwarî dîkeda ke debête morkî here diyarî kesî dîplomat.

Lem pîşeyeda, rêçkey here dilkêş rêçkey siyasîye, çunke emyan xerîkî dozî cîhanîy here hestyar û tirsinake. Ezimûn û helwêstî dirust lem buwareda rêge berew pêgey bala xoş deken, bo nimûne: yarîderî wezîrî henderan, balyoz le Waşîngton û UN û herweha bo erkî nêwbijîwanîy nêwdewletî.

⁵⁶ Serçawe: Kaj Falkman. Generalister och specialister. *Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati*. Carlsson 2008.

Siyaset, serleber dekatewe deselatxwazî. Gişt layenêkî siyasî deyhewêt deselat peyda bikat bo piyadekirdinî siyasetî xoy yan siyasetî hîzbekey xoy. Begîştî siyasetmedar be çawêkî nizim seyrî dîplomat deken, çunke dîplomat hergîz be aşkîra xerîkî siyaset nabin û hergîz bo cêbecêkirdinî kar, rêgey tirsinak nagirne ber.

Mirovî dîplomat mewda degirêt le siyasetmedar, çunke pêy waye siyasetmedar mêşegeşeye⁵⁷ deyhewêt le roşinayî mêdyada bidirewişêtewe belam her zû be nemanî rûnakî le bîran namênêt. Mirovî dîplomat her demênêt, raste nadyare belam heta rojî xanenşînî her sûdbexşe.

«...»

⁵⁷ Mêşegeşe: megezêkî kemtemene balekanî be rûnakî dedirewişênewe, *Mayfly*, hêmaye bo diyardey kurtxayen, be nemanî rûnakî xamoş debêt.

Gutarî pêncem

Siyaset û layenî mirovkar⁵⁸

Siyaset û layenî mirovkar

Cengî Vîyetnam çon em welatey [Swêd] kirde dû bere, herweha le nêw wezaretî henderanîşda dûberekî nayewe. Paşkat agadar kiramewe lewey min katî xoy le hobey siyasî wek parseng nawzed kirabûm bo kargêrîy dozî Vîyetnam beranber Jean-Christophe Öberg⁵⁹ ke zîrekane û dilgermane daway dekird Swêd serwerîy Vîyetnamî bakûr biselimênêt. Twanay min leweda debînira ke ezimûnêkî Asya-m hebû, zûtir le Tokyo kara bûm. Belam ewey min le Japon le nêzîkewe le erteşî amerîkayîm dîbû, wêneyekî geş nebû. Emane xoyan be zal dezanî û begîştî bêrêzîyan beranber jiyarî japonî deniwand, emeş zor car letek japonyanda tûşî lêkgîrbûnî dekirdin.

Bew paşxanewe çî seyr nebû min le dozî Vîyetnamda pitir nêzîkî dîdî Öberg bim nek bibime ew parsengey hobey siyasî temay bû, gerçî le buwarî kargêrî xomda, bo ewey le xora rêberayetîy siyasî newrûjênim, rêçkeyekî taradeyek wîrdî pîşeweranem reşaw degirt. Harîkarîm legel serkaranî xom aram û nermero bû, gerçî demzanî ewan dilşkaw bûn lewey min nebûme ew parsengey mebestyan bû.

Wezîrî henderan Torsten Nilsson⁶⁰ le dozî Vîyetnamda bertawî ew hêze hander û destpêşxerîye xeyalfirewaney Öberg bû. Em hawseferî henderanî bû, eweş nêzîkî xistbûnewe leyek. Ger Öberg bo xoy le geşt baye, ew dem bo seredanî Hanoy, Warşo, Parîs û New York (bo UN), min be şêweyekî katî wek sekretêrî taybetî wezîrî henderan, hawseferî wezîr debûm. Wezîr rojane çend carêk lêmî depirsî aye Öberg dengî nebû? Carêk le welamda gutim: nexêr, tenha sernûserî “Fritid” telefonî kirdûwe. Torsten Nilsson le nakaw be tûreyîyewe gutî: mebestit “Frihet” -e!⁶¹ wêray em nezanîney min derbarey sosyaldêmkokrat, nêwanî min legel Torsten Nilsson da xoş bû, min ew siruşte mone belam germey ewm behend degirt. Peywestêkî nêwaniman rêşalî Skåne-yî⁶² herdûkiman bû.

Baziney dewrî Öberg kesani nêzîk partî sosyaldêmkokrat û pêm waye beşêkiyan endamîş bûn, belam min weham be dirust dezanî rîçkey karmendaney siyasetbederî wezaretî henderan reşaw bigirim.

⁵⁸ Serçawe: Kaj Falkman. Politik och det mänskliga. *Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati*. Carlsson 2008.

⁵⁹ Siyasetmedar û dîplomatî swêdî Jean-Christophe Öberg (1935-92) le nêwan 1967-70 wek sekretêrî wezîrî hendarin nexşî hebû le dariştinî siyasetî swêdî derbarey dozî Vîyetnam. Salî 1970 wek “*birîkarî balyozxane*” *Charge d’Affaires* le Hanoy (pêtextî Vîyetnam) hate dameziran û paşan 1972-74 bûwe yekem balyozî Swêd lewê. Öberg le nêwan 1976-81 balyoz bû le Bangkok (pêtextî Tayland) û 1982-87 le Cezaîr (pêtextî Cezaîr), 1987-91 le Warşo (pêtextî Polonya/Poland).

⁶⁰ Siyasetmedar (sosyaldêmkokrat) -î swêdî Torsten Nilsson (1905-97) salanî 1962-71 wezîrî henderan bû.

⁶¹ Wişey yekemyan *Fritid* wate: katî azad, pişû, wiçan û lew baseda, Falkman legel wişey dûwemda *Frihet* (wate “azadî”) têkelî kirdibû ke nawî bilawkirawey ew demey sosyaldêmkokrat bû.

⁶² Skåne: herêmeke le başûrî Swêd.

Paş gutare serincrakêşekey Olof Palme⁶³ le şarî Gävle salî 1965 ke rexnegirane bû beranber cengî amerîkî le Vîyetnam, pêgey Swêd lay Waşington sardbowe. Ewca katêk hikûmetî Swêd janîwerî 1969 komarî dêmokratî Vîyetnam (Vîyetnamî bakûr) -î be ferimî selimand, peywendîyeke ewendî dîke tezi. Belam le yek dozda ke be lay ray giştîy Amerîka-we girîng bû, Waşington pêy wa bû detwanêt sûd le Swêd wer bigirêt, ewîş mijarî dîle amerîkayîyeke bû le Vîyetnamî bakûr. Swêd take welatî xorawa bû peywendî dîplomasîy letek Hanoy -da hebû, kewate derfetî hebû noreyek le mijarî dîlekanda bibînêt. Leser daway Waşington, wezaretî henderan [î Swêd] – be nyazêkî mirovdostane - lîstêkî daye Hanoy be nawî şêst dîlî amerîkayî û pirsyarî le çarenûsyan dekird. Seretay 1970 Hanoy be lîstêkî çîwarde nawî niwê welamî wezaretî henderanî dayewe - eweş yekem car bû Vîyetnamî bakûr zanyarîy weha bidate welatêkî biyanî, eme rêzlênanêk bû le Swêd.

Helbet Amerîka -yîş be rêzewe deynorîye em hengawe û Swêd berdewam bû Leser em postekarîyey nêwan Waşington û Hanoy. Le kotay 1970 da wezaretî henderan beş beş nawî 368 serbazî amerîkî wergirt ke dîl bûn lay Vîyetnamî bakûr. Le rêy balyozxaney Amerîka -we le Stockholm, lîstekan kil (post) dekiran bo Waşington û lewêşewe bo xizm û kesî ew serbazane.

Firokewanî amerîkayî le Vîyetnam dîl bûn û xanime hawserekanyan be şarekanî Ewrûpa -da degeran layenêk yarmetîyan bidat mêrdekanyan le dîlêtî rizgar biken. Ême le wezaretî henderan pêşwazîman le çendîn deste xanimî weha kird. Serokî em grûpane babayek bû çir û zorbilêy serbe Pêntagon, zor şanokarane basî le pejare û derdedirayî em xanimane dekird ke dabirawin le mêrdekanyan û mêrdîş le zîndanî vîyetnamîda helûmercî dirindaneye. Swêd niwênerayetîy dîplomasî heye le Hanoy, leber ewe çawenorîy lê dekira twanay zor bixate ger bo rizgarkirdinî firokewanekan. Ewan hewilekanî êmeyan beriz denirxand belam hîwadar bûn ême le rêy mirovdostîda ziyadtirman hewil bidaye.

Carêk, tenha çend rojêk bû min le seredanêkî Hanoy gerabûmewe, letek serkarekanî xom le hobey siyasî dîdarêkîman bû legel desteyek lew xanimgele. Paş axaftinî asayî, serkarekanî dawayan lê kirdim xaniman heta derwazey derewe berê bikem. Katêk legel xanimekan û serok şandekeyan tenha mam, zerfêkim le cantakey xom derhêna fotoy têda bû le Hanoy peydam kird bûn. Le ser mêzêkî gewre fotokanim bilaw kirdewe û pêm gutin emane wêney zarokî zamdarî cengin le yek le nexoşxanekanî mindalan le Hanoy. Zarok - be hoy parçe top û napalmî amerîkî - leş sûtawî bê ling û bal, Leser textewî spî rakişa bûn. Daway bexşînim kird lewey xanimanî hawserî firokewanekan rûberûy em berheme debin ke zadey hêrişî firokewanî amerîkîye, belam xom be qûlî bertawî wênekan bûm û demwîst sûd lem derfete degmene werbigirim û pêşanî hawserî firokewanekan bidem ceng çî bedemewe.

Jinekan çawyan le wênekan çeçî û lal bûn, belam serok şandî serbe Pêntagon be tûreyîyewe rûnî kirdewe ke ewan nehatûn bo wezaretî henderanî Swêd bo ewey temaşay fotoy cengî Vîyetnam biken.

⁶³ Olof Palme (1927-1986) siyasetmedar (sosyaldêmkokrat) -î swêdî, salanî 1969–76 û paşan le salî 1982 ewe heta rojî kuştinî, serwezîran bû. Palme le xêzanêkî berzeborjway konewarda zawe. Em heft salan bû bawikî mirdûwe. Le salanî xwêndinî qanûnnasîda bûwe endam le yaney fêrxwazanî sosyaldêmkokratda. Salî 1952-53 xwêndinî tewaw kird û her be sekretêr lay Tage Erlander (1901-1985) [Tage Erlander siyasetmedarêkî nawdarî sosyaldêmkokrat swêde, le nêwan 1946-69 serwezîranî Swêd bû] hate dameziran. Palme salî 1961 bûwe serokî defterî serwezîran, salî 1963 wezîrî rawêjkar, salî 1965 wezîrî danûstan û herweha salî 1967 wezîrî fêrkarî û ewca salî 1969 be koy deng helbijêrdira be demrastî partî sosyal dêmokrat le cêy Tage Erlander û beweş wek serwezîranîş cêy girtewe. Salî 1976 rastirewekan helbijardinyan birdewe, Palme û partî sosyaldêmkokrat bo mawey şeş sal kewtine berey berhelistkaranewe. Le helbijardinî 1982 da serleniwê sosyaldêmkokrat fermanî girte dest û Palme bowe serwezîran heta rojî kuştinî. Palme le Stockholm, salî 1986, be dest kesêkî heta êsta nenas, kujra.

Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

Em babaye jinekanî le mêzeke dûr xistinewe û berew derewe pêş xoy dan. Min destekem berê kird heta derwazî rûwew meydanî *Gustav Adolf* û çawim lê bû swarî otobûsêk bûn çawenoryan bû.

Sbeyroj telefonêkî nakawim bo hat le xanimêkî ew desteyewe. Xanim daway lêm kird bimbînêt çunke basêkî laye giringe. Pêk hatîn, le lobî Girand Hotêl ko bûynewe. Her zû çûwe basekewe: em hergîz bîrî lewe nekirdibowe mêrdekey le Vîyetnam çi kare bûwe û leber ewe wêney mindale zamdarekanî ceng qûlayî naxî hejandûwe. Rastîyş eweye em mêrdekey xoy baş nenasîwe, her zû paş dîdarî yekem mêrdekey bang kirawe bo xizmetî serbazî le Vîyetnam. Ewîş daway hawserîy lêkirdûwe û mareyan birîwe. Nameyan bo yektir nûsîwe belam mêrdekey hergîz boy bas nekirdûwe le Vîyetnam çi kare bûwe. Paşan fermangey ceng peyam denêrêt û delêt firokey mêrdekey le Vîyetnamî bakûr gilawe, em tûşî şok debêt û pêy wa debêt mêrdekey mirdûwe. Paş maweyek agadar dekirêtewe lewey mêrdekey be dîl gîrawe û zîndanîye. Ahêkî pêda dêtewe belam hawkat hest dekat îdî sexte paş nasînî weha kurtxayen û dabiranî weha dirêjxayen, yek bigirnewe. Em taze xoy rahênabû be jiyânî serbexo. Xo eman hergîz xaney hawbeşeyan nebûwe. Ewca paş wêney mindalekanîş hîç dilnya nîye lewey carêkî dî dîdarî ew mêrdey le la mebest bêt!

Diyar bû em xanime pêwîstî hebû bewey em base lay kesêk bidirkênêt namo bêt, dûrebas bêt, belam le rêy wênekanewe karîgerîy hebûbêt Leser dîdî ew derbarey ew mîlîtanêye û herweha helwêstî le deselat. Xanim gutî naşêt em base lay xanime hawserekanî dîke bidirkênêt çunke ewan jiyânêkî hawserîy dirêjtiryan hebûwe û weha pê deçêt birwayan hênabêt bewey reftarî mêrdekanyan çareyekî rewaye bo rêbestin le komunîzim. Em be fermanî Pêntagon, wek “erkêkî welatparêzane”, beşdarî em geşte bûwe. Be wîstî xoy bêt êsta kota bem geşte dehênêt belam naçare debêt le tek grûpekeda hogirîy xoy pêşan bidat dena be mîlîtinewîst morî deken.

Em xanime daway amojgarîy lê nekirdim, daway lê kirdim basî Hanoy bo bikem. Baskirdin lew jiyane aram û pir qurbanîyey rojane le “çawgî gerdelûl” da guzer dekat, bo min pişûyekî giyanekî bû. Le pirsyaryekanîyewe xuya debû xanim çend kem şarezay Vîyetnam û ew xebate azadîxwazîye dirêjxayeney Vîyetname dij be hêzî kolonyal, sereta Franse û paşan Amerîka.

Min lem beserhate çi fêr bûm? Xalî yekem: em xanimey danîştûy giçkeşarêkî Amerîka çend axinirawe bew peyame amerîkayîyey delêt cengî Vîyetnam bo rêbestine le serkewtinî “bîrdozey domînekar”⁶⁴ le Asya, çunke ger serkewêt derhawîştey tirsinakî debêt bo asayîşî Amerîka.

Xalî dûhem: wêney ew zaroke pelbirawane lay xanim bûne çexmaxeyekî sozekî. Beweş xanim kewte rexne lew belgekarîye ferimîyey piştîwanî le ceng dekird. Lewîşewe geyîşt bewey guman le rewayetîy ew kirdare bikat ke mêrdekey le Vîyetnam encamî deda. Em xanime têgeyîşt lewey, beder le helwêstî siyasî, em barûdoxe çi jankêşanêkî bo mirov têdaye.

Xalî sêhem: dîm, le doxî nakokîda, çîrokî rastîne çi derfetêkî heye bo zalbûn beser pirupagendeda.

Helbet hîç çîrokêk boy nîye rastîbûnî beserhat bo xoy pawan bikat, belam detwanêt wêney rûdaweke bigorêt û beweş ew perdepoşe siyasîye damalêt ke le meydanî ceng alawe.

Degutirê: “Layenî biraweye mêjû tomar dekat”, belam madam hîç layenêk serkewtû nîye, tomarkirdinî mêjû bo gişt layekî beşdar awaleyê.

⁶⁴ Bîrdozey domînekar: mebest le diyardey bilawbûnewey modêlî Vîyetnam û komunîzime le welatêkewe bo welatêkî dîke, wek çon pûlî domîne, ger mewday pêwsît le nêwanyanda bêt û yekiyan bikewêt, be zîncîrey gişt pûlekan be dûway yekda dekewin.

Derencamî em dîdare letek xanimanî hawserî firokewanekan pêşanî dedat ke mirovdostî, ger derfetî hebêt be hemû hêzî xoyewe bête pêş û hestî hawsozîy weha serbixat ke gişt laberjewendîyekî siyasî pek bixat, zal debêt beser siyaseta.

Raste parte siyasîyekan xoyan be niwênerî mirovdostayetî dezanin - heyîşe be krokî sazimaney xoy dezanêt. Meger buwargelî wek *saxlemî*,⁶⁵ *fêrkarî*⁶⁶ û *peroşî*⁶⁷ - ke hênde dúbare dekirênewe û bûnete diruşim - çîn, bazine nîn be dewrî mirovkarîyewe? Peroşîy le mirovkarî debêt biçête çêwey sazimanewe bo ewey hêz û taw le cîhanda peyda bikat, wek ewey bo nimûne *Xaçî Sûr* û *Pizîşkî Bêsinûr* deyken. Belam gişt sazimanêkîş - siyasî bêt yan mirovkar - hemîşe kêşey hemecorî bedemewe: nakokîy berjewend, rikaberî, pîlangêrî, şêwandin û gendelî. Partî siyasî pakêcî çareser amade dekat û peyrewanî debêt serleberî pakêceke biselimênin, gerçî lewaneye tenha beşêkî ew pakêceyan belawe baş bêt. Ewca bangeşey dakokî le berjewendîy mirovkarane dûr nîye rêçkeyekî lader bigirêt: dengder peroşî dakokîye le mirovkarî, hîzbîş ew xwastey dengder bo berjewendîy hîzbîy xoy bekar dehênêt. Hokarî lem babeteye rê le xelk degirêt biçine jêr rikêfî sazimanî hîzbîyewe bo dakokî le buwarî mirovkarane.

Le rwangey Swêd-ewe nakokîy Vîyetnam be piley yekem dakokî bû le mafî xofermanîy gelî Vîyetnam û herweha retkirdinewey tundûtîjî, betaybetî tundûtîjîy deselatêkî zilhêz dij be welatêkî biçûk. Piştîwanî le Vîyetnam û rexnegirtin le Amerîka letek peresendinî bizavî Vîyetnamî, geşey dekird. Şorişî lawan bûwe hêzêk deba behend bigirêt, betaybetî leber ewey hawbîr bû legel şorişî lawanî Franse, Amerîka û dewletanî dîkey xorawa. Le layek xebatî lawanî şeyday dad û aşî hikûmetyan han deda û le layekî dîkewe tirsêk hebû lewey layenî naporlemanî bibine cilewkêş. Ewca bo ewey partî deselatdar destpêşxerî û hêzî ledest nedat, deba ew giştira⁶⁸ vîyetnamdoste pelhawêje be lay xoyda rakêşêt. Gerçî siyaseta henderanî Swêd derbarey dozî Vîyetnam derbirînêkî resen bû le nirxandinî sosyaldemokratane û dariştinêkî behêzî Olof Palme bû, belam hewildanî agayane le nêwxoy Swêd -da bo kokirdinewey gişt balekanî bizavî vîyetnamî le jêr alay sosyaldemokratda, bûwe hoy peydabûnî bedgumanî beranber "*syasetî henderanî nêwxo*".⁶⁹

Deysa dîplomat letek nakokîy weha pertî wek dozî Vîyetnam -da çî pê dekirêt? Dîplomat detwanêt wek Jean-Christophe Öberg rast û rewan piştîwanî le yek berey nakokîyeke bikat, ewîş leser binemay behay akarekîy xoy, belam hawkat amancêkî dîplomasî bigirête ber bo ewey gişt layenî nakok bîn û Swêd be nêwbijîwan biselimênin. Be dîdî Öberg, Swêd her leber ewey take welatî xorawa bû cêy mitmane bêt lay Vîyetnamî bakûr, hikûmetî Swêd lay Waşington le buwarî axaftinda sengî debêt. Dîdekeşî hele nebû, çunke Torsten Nilsson çendîn car le layen wezîranî henderanî Amerîka -we pêşwazî lê kira. Em, siyaseta Swêd -î rûn dekirdewe derbarey Vîyetnam û ewanîş rastgoyî emyan lew baseda beriz denirxand. Hem em û hem Olof Palme le layen damudezgey xerîk be dîlî cengewe, supas kiran. Legel eweşda hîç xwastêkî ciddî bo nêwbijîwanîy Swêd, le layen Amerîka -we peyda nebû.

⁶⁵ *Saxlemî*: wate buwarî tendirustî û giyandirustî.

⁶⁶ *Fêrkarî* dekatewe riştekanî xwêndin û barhênan.

⁶⁷ *Peroşî* wate gişt buwarekanî çawdêrîy civakî, bo nimûne: xêzan, zarok, temendaran, herzekaran, tawankarî, alûdebûn û htd.

⁶⁸ Giştira: ray giştî.

⁶⁹ *Syasetî henderanî nêwxo*: çemikêkî cêkewtûwe le zimanî siyasîy Swêd -da bo derbirîn le piyadekirdinî siyaseta henderankar bo berjewendî siyaseta nêwxo. Em çemike yekem car salî 1970 le nûsirawêkî siyaseta medarî rastirewî swêdî Gösta Bohman (1911-1997) hate kayewe bo berengarbûnewey siyaseta Olof Palme û sosyaldemokrata Swêd le ast dozî Vîyetnam.

Nêwbijîwanî le nêwanyanda hebû belam le kenalî dîkewe û tenha bo ewe bû layenî nakok pêk bèn leser kat û cêy axaftin.

Dekirêt dîplomat le ast nakokîy siyasîy cîhanîda helwêstêk bigirête ber bêlayan û çawenorane bêt, bew hîwayey ta zûwe nakokî xamoş bêtewe bê ewey pirîşkî nêzîk Swêd bêtewe. Le nêw hobey siyasîda, le wezaretî henderanî Swêd, degutira cengî Vîyetnam pêşhatêkî labela (*episode*) ye le mêjûda û ke ceng kota bû ewsa dûbare feramoşî Vîyetnam depêçetewe. Belam Amerîka hemîşe wek zilhêzêkî cîhanpoş her demênêt û her ew doste çespîwe debêt ke katî xoy koçberanî ême beşdarbûn le helnanî em welate behêzeda. Em dîde le ser binemay ryalîzimêkî dûrbîn damezira bû nek leser hawsozîyekî katî bo beranberêkî lêkewte. Em dîde leber ewey be welamderewey berjewendîy dûrbînaney swêdî dadenira, deba pêsemî werbigirêt. (Helbet le rûy prinsîpewe mebestêkî dîkey dûrbînaney hebû le siyasetî hikûmetda: le serû hemwanewe piştîwanî le Vîyetnam deykirdewe parêzgarî le Swêd beranber hêrişî biyanî û bo parastinî serxobûnî Swêd).

Le awênay raburdebînda deşêt ew boçûney rexnegir bû le siyasetî Vîyetnam dirust bête pêşçaw: ewete le siyasetî cîhanîda feramoşî Vîyetnamî pêçawetewe û abûrîy bazarî azad cêy abûrîy nexşedarî komunîstaney girtotewe. Belam le rastîda Vîyetnamîyekan serkewtin. Leşkirî amerîkî naçar kiran be bezînêkî şermezarane Vîyetnam cê hêlin. Rêberanî Hanoý welatekeyan yek xist, serxobûn damezira û gişt cîhan "*Komarî Dêmkokratî Vîyetnam*" -î selimand. Hekarî em serkewtine birîtî nebû lewey rêçkeyekî siyasî zal bû beser yekêkî dîkeda, belkû layenî mirovkar bû serkewt beser siyasetda.

Hemûman aydyolojî û peyamî siyasîy cengî Vîyetnam- man le bîrçotewe, belam kes wênay ew kîjole rûtey lebîr naçetewe, le taw girî napalim, be sûtawî herdû balî kirdibowe û be rêgeda ray dekird û deyzirîkand. Wênay em zaroke girgirtûwe, biryarî dadgey mêjûwe beser cengî Amerîka -da le Vîyetnam.

«...»

Gutarî şeşem

Serok û rêberayeti⁷⁰

Serok û rêberayeti

Kesanî serkar le zorbey sazimanda kemînen. Le fermangey henderanîşda⁷¹ her wehaye, deyekî kamendan serok û serkarin. Belam leber ewey kar û keşî kar beradeyekî beriz bertawî rêberayeti, govarî *UD-kuriren* ke taybete be karmendanî wezaretî henderan [î swêd] jimareyekî serleberî terxan kirdûwe bo babeti rêberayeti (jimare 2, salî 2007). Gişt axêweranî em jimareye hawran lewey serok le fermangey henderanda debêt “rûn” bêt. Wate serok debêt amancî sazimanekê û arastey kar bo karmendanî xoy rûn bikatewe û herweha debêt rûnîşî bikate çawenorîy çîye le karmendan.

Le salanî lawîmda katêk le hobey siyasîy wezaretî henderan karim dekird, serkarêkim hebû, zor rûn, babilêm zêderûn bû. Destî dexiste gişt mijarêkî min xerîkiyan bûm û destkarî hemû wirdekarîyekî dekird. Ger mijarêkîş amadey biryardan ba, ba mijarêkî sakarîş ba, neydewêra xoy biryar bidat, berzî dekirdewe bo serbeş, emîş bem rarabûney serkar tewaw herasan bûbû. Bo derbaz bûn lem bare xom wirdebiryarim deda bê ewey biyanxeme berdest babay serkar. Le çend mijarêkî hestyarîşda şîrazebirîm dekird û bê geranewe bo serkar, xom mijarekem debirde lay serbeş çünke demzanî le wîrdharênî biryarnederaney serkar bêzar bûwe.

Carêkî dîke le balyozxaneyek karim dekird û lewê serokêkim hebû be hîç corêk rûn nebû. Em be hîç corêk xoy be wîrdedoziy karewe xerîk nedekird û rêy dabû karmend be xwastî xoyan karî xoyan saz biken. Belam wêray narûnî le raperindinî karda, rûnîyek le salarî (*authority*) -y ewda dedirewişayewe û giştiman rêziman lêy degirt. Binemay ew rêze çî bû? Ezimûn, zanîn û salarî. Erê, debêt bîselimênîn, salarîyekî zigmak bû.

Serokayeti û rêberayeti yek babet nîn. Serokayeti xeslet nîye belkû pêgeye le peyney sazimanda, belam rêberayeti taybetmendîye mirov heyeti bê ewey pêwîst bikat serok bêt. Ew serkarey le serewe basim kird, rêber nebû tenha serok bû. Ger pêwerî êstay rêberayeti kara ba ew hergîz bo serkareti nawzed nedekira.

Gunnar Hägglöf⁷² delêt bext yar bû le tengijeyekî ciddîda amade bûm: sextangî cengî dûhemî cîhanî. Lew demeda wêray cewanî, Hägglöf nawzed kira bo postêkî weha hergîz pêy nedegeyişt ger ceng

⁷⁰ Serçawe: Kaj Falkman. Chef och ledarskap.

Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati. Carlsson 2008.

⁷¹ Çemikî “henderan” lêreda beranber “karûbarî derewe” bekar hatûwe. Bo nimûne wezaretî henderan dekatewe wezaretî karûbarî derewe.

⁷² Dîplomati nawdarî swêdî Gunnar Hägglöf (1904-1994) çendîn pêgey girîngî dîplomasîy hebûwe, bo nimûne: serokî hobey bazirganî le wezaretî henderan 1939-44, wezîrî rawêjkar (bê wezaret) payîzî 1939, balyozî rasparde (*Envoy, Envoyé*) le Haghaag 1944-46, le Mosko 1946-47, le UN salanî 1947-48, balyoz le London 1948-67 û le Parîs 1967-71. Salanî cengî dûwemî cîhanî Hägglöf noreyekî berçawî dî le buray siyaseti bazirganîy cengda. Zîrekane û serkewtû sewday bazirganîy legel Almanya û paşan legel Brîtanya û Amerîka -şda berêwe bird. Hägglöf beserhatî ew salaney le sê kitêbda tomar kirdûwe: *Svensk krigshandelspolitik under andra*

daway karmendî wehay nekirdaye (bê ewey xoy bîlêt, mebest: karmendî zîrek û kirde). Le barî asayîda, deba ewîş bew rotîned a têper ba ke jimarey salanî xizmet dekate binemay nawzedkirdin.

Ger jimarey salî xizmet pêwer bêt bo pêgey serokayetî, kes pest nabêt, meger kesanêk xoyan pê lebartir bêt bo ew pêgeye çunke xoyan be zanatir û twanatir dezanin. Ger serok jîr bêt, derfet dedate ew lawaney lebartirin, heta dekirêt serferazane twanay xoyan piyade biken.

Zor car, katêk dîplomatî law le kesanî temendartirî nêw pîşeke têper debin, kêşey hestyar le nêwanyanda peyda debêt. Ewsa debêt serokî law salarîyekî wehay hebêt yan peyda bikat ke karmendî temendartir serokayetîyekey lê biselimênêt.

Wezaretî henderan le “*rênamey serokayetî 2003*” da sê norey serokayetî le nêw fermangey henderanda diyarî dekat: “norey rêber”, “norey zanyar” û “norey niwêner”. Yekem merc le “norey rêber” da birîtîye le giştbinî û boçûndarî.

Giştbinî merc nîye bikatewe boçûnî jîrane. Belam herdû xeslet girîngin bo ewey mirov wek serokî baş rêzmend bêt. Giştbinî wate twanat hebêt nîgat le helûmercî demûdest beriz bikeyewe. Em twanaye “*mewda*” -t bo terxan dekat û emîş le strês, pelekirdin û biryarî bêserûber dûrt dexatewe û herweha hestêkî aramî le nêw karmendanda pexş dekat.

Cige lewe “*mewda*” rêge xoş dekat be şoxîyewe le barûdoxeke binorît. Rwaney şoxîkar badaneweyekî nakaw peyda dekat, xende û pêkenîni lê dezêt. Şoxî çareyekî karaye bo xawkirdinewe girjî. Zor car le buwarî dîplomasîda pena debirête ber şoxî, çunke rê dedat be derbirîni tîjî weha ke rêk be bedgoyî lêk nadirêtewe belam tiyan (narastewxo) be lêkdanewey bîser.

Serokî baş kesêke, karmendan pêyan xoşe xoyan geş biniwênin leber çawî. Bew core serok layenî here başî her yek lew karmendane tîj dekatewe. Ger serok bêfer bêt kes hewil nadat xoy le la biniwênêt.

Carêk nûsirawî mijarêkî rotînîm birde ber destî serkarêkî kemhuner. Gutî: çake, to detwanît wajûy bikeyt. Minîş pêm gutewe weha başe ew wek serkar wajûy bikat. Nûsirawekanî xistewe be destim û gutî: “şikomendîy bo ew keseye şayenî bêt!”. Min sersam bûm bewey em serkare pêy waye şikomendîye bo min ger be nûserî nûsirawêkî weha rotînî binasirêm. Ew pêy weha bû padaşte, min pêm wabû sûkayetîye. Dû dîdî weha ciyawaz beranber heman nûsiraw!

Helbet “norey niwêner” bo dîplomat sengî taybetî heye. Emane kesanêkin rojuşew le her kwê bin niwêneratîy welatî xoyan deken. Dîplomat natwanêt her leber ewey katî kar le balyozxane tewaw bûwe derge dabixat û bîlêt ewca katî jiyani kesekîy xome. Dîplomat hemîşe amadeye û katî kêşe dête dest. Şewêkiyan wezaretî henderan le Lîsabon telefonyan bo min kird le malewe û gutyan balyoz le hotêlêk le layen xanimanî bergdirûy tûrewe gemaro dirawe, bo neselimandinî ew mûçeyey xawenkargey swêdî diyarî kirdûwe. Balyoz lew hotêle şîvî dexward legel serokî kompanay çinkar û neydetwanî hotêleke cê bihêlêt. Rojname û tîvî lewê amade bûn. Pirsyar ewe bû aye min amadem biçim bo ew hotêle û balyoz lewî rizgar bikem? Helbete. Be pele gerok (otomobîl) -im hajwa bo hotêl û le cadeyekî piştewe ramgirt, şofêrî balyoz gerokî le berdem derwazey hotêleke ragirtibû, pê m gut bajwêt bo malewe û min hewil dedem balyoz be nihênî be gerokî xom derbaz bikem. Saz bû. Balyoz şilejabû le heray xopêşanderan û le çawdêrî mêdya leber ewe be memînûnîyewe be dûwamda hat û

världskriget (1958). *Det kringrända Sverige* (1983). *Vägen ut* (1984). Cige lewe Hägglöf bîrewerîy xoy le pênc bergda bilaw kirdotewe (1971–75). Herweha çendîn berhemî dîkey heye derbarey mêjûy hawçerx. Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

le dergey piştewe derçûyn berew geroke penhanekem. Serok kompanya swêdî kewte ber rexney zorî rojname û tivî, belam xoşbextane balyozî Swêd tewe negila.

Em balyoze konewezîr bû, paş kotabûnî erkî hikûmetî em pêge aramey be xelat diraye. Le nakaw kudetayekî serbazî ew aramiye şêwand - “şorişî mêxek”.⁷³ Erkî balyoz giran bû bewey deba peywendî saz bikat legel rêberanî niwêy welatda û herweha legel ew siyasetmedaraney, paş çendîn salî tarawge, gerawinetewe Portogal. Em balyoze derwestî em erke nedehat, çunke ne zimanî portogali dezanî û ne temenişî guncaw bû: rêberanî tazey welat birîti bûn le efseranî lawî taze gerawe le kolonîyekanî Portogal -ewe, balyozîş le sinûrî xanenşîniyewe nêzîk bû.

Stockholm pey be barûdoxeke bird û her zû karmendêkî lawî nard bo Lîsabon bemebestî sazkindinî peywendî û raportkarî. Sereta kareke hasan nebû, çunke hemû banghêşinêk bo dîdarî taybet arastey balyoz dekira û çawenorî eweş dekira xoy le rêberanî niwê bête pêş nek rawêjkarêkî balyozxane. Balyoz zorî ew banghêştinaney bo min cê dehêst çunke lew hemû pêşkeşkarî û gutaraney saz dekiran em hîçî pê nedekira. Minîş zû nasyarîm peyda kird legel siyasetmedar û erteşkare here berçawekanî welatekeda.

Belam kêşeke çareser nebû: balyozêk neyhewêt yan netwanêt erkî niwênerayetîy xoy cêbecê bikat bo balyozxaneke debête rêbest bo geyştin be rêberanî welatî wêstge,⁷⁴ çunke nakirêt karmendanî jêrtir norey balyoz bigirne esto. Min hîçim derbarey em base bo wezaretî henderan nenûsî çunke kêşeke lay rêberanî siyasîyman aşkira bû. Belam le seredanêkimda bo Stockholm kêşekem legel wezîrî henderan bas kird. Ewîş pêşanî da ke baş aşinay kêşeke heye betaybetî leber ewey ew balyoze nasirawe bewey meynoşîni pêş dexat nek raportinûsîn, belam em balyoze katêk wezîr bûwe xizmetî weha gewrey kirdûwe êsta nakirêt lem pêge biçûktirey dabirîn.

Heta emrojeş rû dedat ke wezîrî derkiraw be pêgey balyoz xelat dekirên, gerçî damezirandinî weha tewaw serpeçîye le mercekanî wezaretî henderan bo nawzedkindin. Car heye nawzedêkî siyasîyane bo pêgeyekî diyarîkiraw guncawe, bo nimûne siyasetmedarêkî buwarî komek bikirête balyoz le welatêkî komekberda, belam paş ew pêgeye em balyoze siyasetzadeye daway pêgey dîke dekat, bo nimûne le Ewrûpa -da ke pêwîstî be hîç zanyarêk niye derbarey komek. Mirov ger carêk hate çerxufelekî wezaretî henderanewe pêy xoş niye lêy derçêt.

Şapeyamî govarekey UD-kuriren derbarey serokayetî delêt: “xonasîn” û “asûdeyî nêwxo” xesletî girîngin bo serok. Diruste, bebê “asûdeyî nêwxo”, serok natwanêt asûdeyî be karmendan bibexşêt û herweha bê “xonasîn” mirov natwanêt kesani dîke derik bikat. Belam em “xodameziran” e metirsîy bedemewe heye, metirsîy lexo razîbûn û narazîbûn le kesani dîkey xawen dîdî ciyawaz. Xonasîn zor car gumirayî bedemewe - mirov xoy corêk debînêt, belam dewrûber dîdyan tewaw ciyawaze.

Xowêne - ew dîdey mirov heyetî derbarey xoy - be asanî deşewêt bew guzerane berçaw û nazoyey balyoz heyetî, koşkî mezin be aşpez û şofêrewe, be destresî bo hemû kesani payedar. Ew balyoze pey nabat bewey gişt em diyardane wam (qeriz) -î katekîn. Mewda nagirêt lew erkey pêy spêrdirawe û be hasanî debête bela bo kesani dewrûber. (Beranber handanî “xot binase!” Le welamda dîplomatî nerêtekî delêt: “Supas, belam min namewêt bêhuner bim”).

“Fîdbak” - aye dekatewe ewey karmend be serkarî xoy bilêt min le to narazîm? Rastgoyî lem babete debêt be nerimî repêş bixirêt û herweha debêt çareserî berceste legelda bêt bo ewey nebête mayey têkdanî keşî balyozxaneke. Serokêk hest be dizandinî karmendan bikat, le nêwyanda degerêt be

⁷³ Şorişî Mêxek: *Revolução dos Cravos* (25 april 1974) le Lîsabon -î pêtextî Portogal dijî dîkitorî welat berpa bû.

⁷⁴ Welatî wêstge: ew welatey balyoz karî lê dekat.

dûway kesanî helgerawe, le encamda dûberekî peyda debêt. Le doxî wehada hîç balyozxaneyek natwanêt dirust kar bikat.

Amojgarîyek bo karî serkewtû le Japon birîtîye le “Xot le bîrbike”. Wate beşêk be le tîmeket û sergerimî erkî hawbeş be. Emeye debête mayey dilgerimî û le grûpda bilaw debêtewe. Belam dîsan lay serok, twanay helsengandin û derfetî kontirol girîngin.

«...»

Gutarî heftem

Peyv û ziman⁷⁵

Peyv û ziman

Jan Eliasson⁷⁶ le dîmaneyekda twanay zimanzanî û mêjûnasî lay kesî dîplomat beriz denirxênêt. Bo pêşandanî norey ziman, Eliasson giftûgoy⁷⁷ agirbest le nawçeyekî Sûdan, dekate nimûne. Ew agirbeste neba karwanî komekî mirovdostane nedegeyişte ew 100 hezar kesey le tenganeda bûn. Sereta layenekanî ceng be hiç corêk agirbestyan nedeselimand belam Eliasson bebîrîda hat wişey “agirbest” bigorêt be destewajey “rarewî mirovkar”. Ewca, paş heşt kajêr, karwanî komek kewte rê. Lew demewe ew çemike le buwarî firemîllîda cêgîre.

Eliasson lew dîmaneyeda delêt:

Bekarhênanî ziman şadimanîye. Mirov debêt peroşî şebengekanî wişe bêt. Çi zarekî çi nûsiraw. Hawwata ciwanîy debexşêt, terazkirdinî zemanewanî, ba le dakewtida ciyawazîyekî ewtoy nebêt, le demî giftûgoda zor car serkewtinî bedemewe.

Giftûgoy nêw konferensî asayiş û harîkarîy ewrûpî,⁷⁸ salanî 1970 le Jenêv, be radeyekî beriz gîrodey wişe bû. Min wek niwênerêkî Swêd bo destey giftûgo derbarey dozî agahî (information) - lewey pêy degutira korî sêhem - herdem be guman bûm lewey em giftûgoye giranxerc û xawe şayenî ew hemû mûqlaşî, kat û pûle bêt (delên goya rojane yek milyon dolarî têtçûwe). Derbirînekanî dewletanî sosyalîst bo dakokî le helwêstî xoyan rojane û heftane dij be gişt core azadîyekî agahî zor aşkira bûn û

⁷⁵ Serçawe: Kaj Falkman. Ord och språk.

Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati. Carlsson 2008.

⁷⁶ Dîplomat û siyasetmedarî swêdî Jan Eliasson (1940-) salî 1965 le wezaretî henderanî Swêd damezira. Lew demewe çendîn pêgey dîplomasîy pê spêrdirawe. Maweyek le şaranî wek parîs, bon û Waşington karî kirdûwe. Salanî 1982-83 rawêjkarî siyasî bûwe le wezartî henderan û le nêwan 1983-87 bûwe serokî hobey siyasî. Le nêwan 1988-92 pêgey balyozî Swêd -î diraye le UN. Lew pêgeyeda û le nakokîy Êran û Îraq -da em niwênerî kesekîy sekretêrî giştîy UN bû. Eliasson le salanî 1994–2000 pêgey yekem yarîderî wezîrî henderanî diraye û 2000–05 kiraye balyozî Swêd le Waşington.

Eliasson 2005–06 le UN da bûwe serokî encumenî giştîy - *President of the United Nations General Assembly*. Salî 2006 kiraye wezîrî henderanî Swêd. Salanî 2006-08 Eliasson “balyozî rasparde” (*Envoyé*) bû le kêşey Darfûr -da. Salî 2010 le layen Ban Ki Moon -î sekretêrî giştîy UN ewe kiraye balyozî yek le *amancekanî firajûtinî hezare - Millennium Development Goals (MDGs)* û salî 2012 pêgey cêgirî sekretêrî giştîy UN pê spêdira.

Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

⁷⁷ Ger zarawey “danûstan” bo *Communication* terxan bêt, lewaneye “giftûgo” bo sewda û mameley ferimî, bo *Negotiation* û herweha “bênewbereg pêkhatin” bo *Mediation* baş bin.

⁷⁸ Konferensî asayiş û harîkarîy ewrûpî: *Conference on Security and Co-operation in Europe (CSCE)* salî 1973 hate damezarin û paşan salî 1995 nawyan gorî be “*Sazimanî asayiş û harîkarîy ewrûpî - Organization for Security and Co-operation in Europe (OSCE)*”.

mirov tewaw le bîstinyan bêzar debû. Belam mêdya basî dekirde ke berhelistkaran le welatanî sosyalîst em konferenseyan behend girtûwe, pena debene ber destewajekanî nêw têkstî xorawa, ke derbarey azadîn û wek kutekî siyasî bekaryan dehênin dij be sensûr û yasaxkirdinî rojnamey xorawayî û ... htd. Xebatî berhelistkaran heta dehat tundtir debû, dewletekanîşyan bo xoniwandin le konferensekeda, naçarî kemêk nerimî bûn.

Guteyekî niwênerî Sovyet dêtewe bîrim em base rûn dekatewe, gutî: “Ême namanewêt rojnamey xorawayî bête Sovyet -ewe, çunke ewane tenha rûdawî nayetî (nêgetîv) beser dekenewe, wek bankbirîn, kuştin û karesatî celû.⁷⁹ Boçî hîç basî babetî geş naken, bo nimûne katêk celû le katî xoyda degate cê?”.

Em guteye nukte nebû. Belam giftûgoy Jenêv derbarey wata, bekarhênan û azadîy wişe, bûwe rîşalêkî girîng lew kempêne siyasîyey paş maweyekî kurt şûrey Berlîn -î rimand.

Dîplomatêkî nawdarî swêdî ke cexitî Leser sengî wişe dekirde le buwarî firemîllîda Dag Hammarskjöld⁸⁰ bû.

Katêk fişek zayeley dê
Em le jînî wişe degera
Bo xatirî jiyân.

Em Haiku⁸¹ (Hayku) yey Hammarskjöld -î sekretêrî giştî - le nêw 109 “Kêlerê”⁸² -y dîkeda - dû cor rûnkirdinewe heldegirêt. Yekem, koşanêke bo bexşînî jiyân be wişegelî nêw giftûgo bo ewey rêçkey

⁷⁹ Celû: şemendefêr, qîtar, *train*. Serçawe: Celizade M.M. “Zarawesazîy pêwane”: www.mamosta.net.

⁸⁰ Dag Hammarskjöld (1905-1961) dîplomatêkî nawdarî Swêd -e, le salî 1953 we heta mirdin sekretêrî giştîy UN bû. Salî 1936-45 pêgey yarîderî wezîr (*Secretary of State*) pê dira le wezaretî darayî û salî 1946 çûwe wezaretî henderan. Salanî 1947-48 niwênerî Swêd bû le giftûgoy OEEC da û salanî 1949-51 yarîderî wezîr bû le wezaretî henderan. Hammarskjöld salanî 1951-53 bûwe wezîrî rawêjkar (wezîrî bê wezaret). Le salî 1953 we û paş maweyek berhelistî le layen Sovyetewe, Hammarskjöld be sekretêrî giştîy UN hate helbijardin. Le salî 1954 ewe bûwe endamî Akadêmîy Swêd (*Swedish Academy - Svenska Akademien*).

Hammarskjöld wek sekretêrî giştîy UN xizmetî cêgirtûy kird û salarîyekî tewaw niwêy bem pêgeye bexşî. Her bo nimûne le sextangî Siwês -da, salî 1956 helwêstî Hammarskjöld bûwe hoy sazkindinî hêzêkî aştîparêzî UN bo ew nawçeye û paşan bûwe destawêjêkî karîger bo nêwbijî le nakokîy çekdaraneda.

Le sextangî Kongo -da, salî 1960, Hammarskjöld noreyekî çalakî bînî û hewilî da çareyek bigirête ber yekbûnî Kongo biparêzêt. Hawkat xebatî dekirde bo serferazbûnî pêgey sekretêrî giştî. Belam em hewilaney tûşî berbest bûn le layen Sovyetewe, eman hem rexneyan le rêbazekey Hammarskjöld hebû bo çareserî kêşey Kongo, hem dijî em çalakî û serferazîyey UN bûn le sextangî nêwdewletîda.

Mangî sêptemberî 1961 le nawçey Ndola le welatî Zambiya -y êsta firokekey Hammarskjöld berboyewe û emîş kujra. Firelayanîy kesayetîy Hammarskjöld be taybetî lew berhemaneda xuya debin ke paş mirdinî xoy, salî 1963 be nawî “*Vägmärken*” (“*Kêlerê*”) bilaw kiranewe.

Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

⁸¹ Haiku (Hayku): şêwazêkî honrawey japonîye, pêk dêt le 17 “*mora*”. Begîştî hayku birîtiye le dû rîz û sê dêr û 5+7+5 *mora*. Mora wate birgedeng ke dekatewe yek dengdêr (bizwên, vokal) yan yek dengdêr û yek dengdar (konsunanit). Leber ewey gişt wişe yan derbirînî japonî be dengdêr yan be “n” tewaw debin, hunerî “serwa” (qafiye) corayetîy zorî bedemewe namênêt û le dariştinî honraweda nabête amirazêkî sûdbexş. Belam dariştinî honrawey pênc yan heft *mora* hem awazbexşin û hem bo zimanî edebîy zarekî, xoştir lebîran deçespin. Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

⁸² *Kêlerê*: lêreda hem kêlerêye û hem amajeye be nawî kitêbe nawdarekey Hammarskjöld: *Vägmärken* (1963).

destûrî UN bigirne ber, ke selimandey gişt dewletanî endame, be mebestî rizgarkirdinî jînê xelk. Dûhem, deşê em honraweye aşkirakirdinî evîn bêta bo wêje (edeb). Axir wêje lay Hammarskjöld tenha sergerimî nebû, pêwîstî bû.

Wêje û honînê honrawe ew xorake bû Hammarskjöld pêwîstî pê bû le jiyânê giyanekîy xoyda. Le dûwa firînêda le Leopoldville⁸³ ewe (Kîşasa -y êste) bo Ndola le sêptemberê 1961 da Hammarskjöld berhemêkî felsefî-honrawekarîy Martin Buber⁸⁴ be nawî "*Ich und Du*" - "*min û to*" - tercemey swêdî kird. Bo xoyîşê deygut, bo terazkirdinî hest û hoşî xoy, heta giftûgoy aşîparêzî sextitir ba, berhemî alozkawtirî wêjeyî heldebijard.

Rêzgirtin le wişe lay Hammarskjöld:

Yekem merce lew dîsîplîn (riştey zanyar) eda ke mirov bar dehênêt berew riskan - riskanê hizirî, sozekî û akarekî. Rêzgirtin le peyv merce bo firajûtin - mebestîş le rêzgirtinî peyv ewperî perwa û şeydabûnî xonefiroşî naxekîye bo rastîne, ke dekatewe rêzgirtin le civak û le mirovayetî. Bedkarî legel wişeda dekatewe bêrêzî beranber mirov. Debête binkolkirdinî pird û jehrandinî kanyaw. Karî weha be karwanerêy dûrûdirêjî mirovbûnda paşekîşeman pê dekat.

«...»

Gorînê zimanî "*Lîstî dîplomatan*" le fransîyewe bo înglîzî şorişî le mêjûy dîplomasîda berpa kird. ("*Lîstî dîplomatan*" birîtiye le tomarêk be nawî dîplomatî welatanî dîke). Swêd salî 1992 "*lîstî dîplomatan*" -î bo yekem car be înglîzî pexş kird. Ber lewe zimanî fransî *par excellence*⁸⁵ [ber le hemwan] zimanî dîplomasî bû.

Zimanî fransî le nowerastî sedey hejdeyemewe balî beser dîplomasîy Ewrûpa -da kêşa bû. Giftûgoy Vîyenna (*Vienna*) y 1815 serleber be fransî bûn. Le *Konferensî Parîs* -da 1918-1919 zimanî înglîzî wek zimanî konferens bûwe zimanêkî hawşanî fransî. Hekarî yekemî em gorankariye helbet amadebûnî behêzî Amerîka û amadekarî bû bo pêkhênanî "*Komkarî Dewletan*" (*League of Nations*).

Serdestîy zimanî înglîzî le buwarî firemîllîda paş cengî dûhemî cîhanî birewî hêna. Serkewtinekanî Amerîka û Bîrtanya le Ewrûpa û Asya -da zimanîşyan legel xo hêna. Katêk min le fêrge demxwênd [le

⁸³ Şarî Leopoldville paytextî welatî Kongo-Kîşasa -ye. Le 1960 -ekanda ceng le welatî Kongo helgîrsa, Mobutu salî 1965 be kudeta fermanî girte dest, nawî pêtextî gorî be Kîşasa û nawî welatî gorî, sereta be *Komarî Dêmkokratî Kongo* û paşan le nêwan 1971-1977 be Zaîr. Paş 1977 welateke nawinirayewe *Komarî Dêmkokratî Kongo*.

⁸⁴ Feylesûf û dînnasî îsiraîlî Martin Buber (1878-1965) le nêwan 1930-33 profîsorî dînnasî bûwe le Frankfurt. Salî 1938 paş ewey Hitler deselatî girte dest, Buber mafî wanegutinewey nema û koçî Felestîn -î kird û her ew sale bûwe profîsorî felsefey civakî le zankoy îbirî le Urşelîm. Wek feylesûf Buber be "*binemay diyalogbendî*" nasirawe.

Yekem car em dîde le kitêbî "*Ich und Du*" ("*min û to*") (1923) hate derbirîn. Buber lewêda bas le dû "*wişey binema*" yan "*cût-wişe*" dekat: "*min-to*" û "*min-babet* [ew babete]". Em "*min*" e dête gorîn û peywende be diyalogî "*min*" aye legel "*to*" daye yan raman û norînî "*min*" e le "*ew babete*".

Gişt "*to*" -yek berhereşeye bikirête "*babet*". Gişt "*diyalog*" -êk berhereşeye bigordirêt be "*norîn le babet*". "*peywendî min-to*" peywendîyek nîye tenha le nêwan mirov-mirov û mirov-xudada hebêt, bigire deşê le nêwan mirov le layek û giyanewer, ruwek û tenanet babetî bêgiyanîş, le layekî dîke peyda bibêt.

Serçawe: zanyaristanî swêdî: *Nationalencyklopedin*.

⁸⁵ *Par Excellence*: çemikêkî fransîye wate: *ber le hemwan*.

Swêd], salanî ceng [î dûhemî cîhanî], zimanî almanî yekem zimanî biyanî bû. Salî 1959 katêk le wezaretî henderan karim destkewt zimanî fransî yekem zimanî dîplomasî bû - gerçî le înglîzî kemtir birewî hebû. Min le Vîyetnam sûdim le fransî bînî belam lewêş înglîzî bedem katewe bûwe yekem zimanî biyanî.

Înglîz lem rojgareda çîdî xawen norey baladest nîn le siyasetî cîhanîda, belam wek barhelgirî zimanî înglîzî noreyekî dîplomasîy berayîyan heye naşêt behendî negirîn. Dîplomatanî brîtanî le UN da le hemwan ziyatir pêşnyazî UN daderêjin. Em baladestîyey dariştin, *Komîsyonî Ewrûpî (European Commission)* û zor sazimanî firemîllîy dîkeş degirêtewe. Hawkaran zor car reşnûsî yekem bo brîtanîyekan cê dehêlin, çunke brîtanîyekan le hemwan baştir le înglîzîda zalin, şarezay hemû şebeng û lawatakanî hen. Amerîkayî kemtir zalin beser zimanekeda û cige lewêş le rûy siyasîyewe, ger reşnûsî yekem darêjin, cêbawer nîn. Ewanîş em erke bo brîtanîyekan cê dehêlin. Em peywestî zimane behêztirîn bestere le buwarî *“peywendîy taybet” (special relationship)* -î brîtanî û amerîkayî.

Mirovî swêdî le axaftinî înglîzîda başin belam le nûsînî têkstî înglîzîda kemtir başin. Gunnar Hägglöf nozde sal balyozî Swêd bû le London, têkstî be înglîzî denûsî û paşan tercumanî balyozxane be sûrexame pîrî dekird le rastkirdinewe. Em xanime deygut be degmen nûsînekanî Hägglöf heley têdaye, destkarîyekanî em derbarey *“xoşrewtî”* y têkstekeye. Be cêgorkêy wişe, be gorînî wişeyek be wişeyekî dîke, be gorînî daçek,⁸⁶ be dabeşênî risteyek bo dû riste, degeyte ew rîtime nermey înglîzîy baş - û kesanî balay korî dîplomasî derî debirin.

Mirovî fransî bertekî nayetîyan debêt ger kesêk be fransîyekî şikeste bête go – eme be kizîy zîrekî lêk dedenewe. Belam înglîz herasan nabin ger kesî biyanî înglîzîyeyek şikeste bêt - ewan rahatûn, dezanin xelk hemûy wehaye. Înglîz le giftûgoda detwanin sûd lew diyardeye bibînin û dariştinî weha repêş bixen beranber pey pê nebat. Leber ewe şandî swêdî debêt hemîşe endamêkî hebêt tewaw şarezay zimanî înglîzî bêt.

Helbet ger mirov zimanêkî dîkey biçûktir taradeyek baş bizanêt û bekarî bihênêt, lay kesanî ew zimane zimanî zigmakiyane, debête cêy rêz. Belam bo xo ladan le barî sengela, ger hate ser *“karûbar”*, debêt mirov herdem bigerêtewe bo zimanî înglîzî yan zimanêkî dîkey sêhem ke herdû la bîzanin. Xoman baş dezanî mirov çend herasan debêt le axaftinî kesêk zimanî swêdîyeyek baş nebêt, peyv û derbirîn bekar bînenêt şyawî zimanêkî baferheng nebêt. Hest dekeyt çon toyîş naçar debêt astî zimanî xot dagirî û bewêş alugorî bîrmendane kiz debêt.

Carêk le Tokyo pirsyarim le ewrûpîyeyek kird ta çi radeyek zimanî japonî dezanêt. Gutî: *“Başim. Belam paş heft xulek axaftin namênêt”*.

Zor car çemikî *“zimanî dîplomasî”* be watay arayîşkarî û dariştinî ciwankarane bekar dêt. Her zû le wezaretî henderan, bo axaftin legel welatanî dîke, mirov fêrî em hunere debêt. Axaftinî patewpat⁸⁷ le babetî hestyarda, zor zû be rencêner, dilşkên û tenanet rûdarîy lêk dedirêtewe. Ger layenî beranber wezaretêkî henderanî dîke bêt ewa dîplomatekanyan pey deben be mebestî pişt ew rêzdarîye û berzîş ray degirin çunke amajeye be ezimûnî pîşewerane. Pena birdine ber *“zimanî dîplomasî”* core mewdagîrîye le mijareke, bo ewey gutar lexora nebête hoy wirûjandinî bîser û xwêner.

Le raportkarîda zimanêkî dîke karaye. Debêt sakar, rûn û lojîkane bêt. Hawkaran le welat, le encumenî wezîran, wezaretî henderan û çendîn fermangey dîke be lêşaw raportyan bo deçêt, leber ewe raportinûs debêt wêneyekî weha roşinak derbarey barûdoxeke darêjêt lebîran biçespêt. Belam

⁸⁶ Daçek: amirazî peywendî, *Preposition*.

⁸⁷ Patewpat: rûn û aşkira, *Explicit*.

zor car roşinakî beser şirovekarîda zal debêt. Ewsayiş rîsk (metirsî) heye wêney barûdoxeke hênde sakar derçêt çi paşxanêkî şirovekaraney pêwe nemênêt derbarey mebest û hokar.

Rojgarî “şorişî mêxek” le Portogali nêwerastî 1970 kanda zor car deba barûdox bo rojnamegeranî swêdî mêwan rûn bikemewe. Rojnamewanêkî nawdar, ke peyaminêrî henderan bû bo yek le rojname balakanî Swêd ravekarîyekey doxî siyasî pê birîm û gutî: “başe, baş. Pêm bilê kamyan *partî gel -e*?”⁸⁸ Em wêneyekî sakarî le partekanî Portogal gerek bû leser modêlî Swêd, bo ewey xwêner be asanî bitwanin barûdoxî Portogal derik biken bê ewey bikewine jêr barî ew dakewte alozewe.

«...»

⁸⁸ Wate kam lem partaney Portogal hawcorî *partî gel (liberalekan)* -î Swêd -e.

Gutarî heştem

Kamen xesletî dîplomatî baş?⁸⁹

Kamen xesletî dîplomatî baş?

Harold Nicolson⁹⁰ le kitêbe kilasîkekeyda *Diplomacy* çapterêkî be nawî “*dîplomatî nimûneyî*” heye derbarey xesletî dîplomatî bêgerd.

Yekem taybetmendî lay Nicolson birîtîye le “*cêbawerî*”. Dîplomat ger hem lay deselatdaranî welatî mêwandar û hem lay hikûmetekey xoy cêbawer nebêt çî serkewtin wedest nahênêt. Cêbawerêş daway akarî abirûmendane dekat – her emeyîşe mayey destiroyî akarekî.

Akarî abirûmendane wişeyekî dîkey modêrnî hawwatay heye: “*serwerî*”. Emyan çemikêke Dag Hammarskjöld wek derbirînêk le riskanî hoş, berzî denirxand.

Yekem pêwer lay Nicolson bo akarî abirûmendane birîtîye le “*rastgoyî*”:

Lêreşda mebest tenha ewe nîye mirov xoy dûr rabigirêt lewey agayane zanyarîy nadirust bidat, belkû wêray eweş peroşêkî zor serincderane bo xogirî le pêdanî wênay nadirust û herweha le şardinewey rastî. Dîplomatî baş debêt legel xoyda dilnya bêt lewey be hîç corêk berdaşt⁹¹ -êkî nadirust cê nehêlêt lay ewaney em giftûgoyan letek dekat.

Hammarskjöld heman rêçke degirête ber û delêt yekem pêwerî “*serwerî*” birîtîye le şeydabûnêkî serrastaney naxekî bo rastî.

Nicolson denûsêt: her serkewtinêk le rêy nadirustewe wedest bêt, serkewtinêke nîgeranîbexş û naasûdeye. Aşkirabûnî nek tenha nawbangî ew kese têk dedat, belkû ziyar be abirûy hikûmetekey ew keseş degeyenêt.

Weha pê deçêt zor le nûseranî em kitêbe⁹² legel Nicolson hawra bin Leser ewey pêwerî rastgoyî le dîplomasîy cêbawerda, şarêsaye. Belam, wek dîplomatêkî swêdî rûnî kirdotewe, pêwîst nakat serleberî rastîyekeye bigutirêt. Lewey girîng bêt beşêk rastî be negutirawî bimênêtewe ca bo xo ladan bêt le birîndarkirdinî beranber yan bo paşekewtkirdinî bêt bo hengawî dîkey giftûgo. Emyan nabête narastgoyî.

⁸⁹ Serçawe: Kaj Falkman. Vad kânnetecknar en god diplomat?
Kaj Falkman. *Plikten och äventyret: upplevelser av diplomati*. Carlsson 2008.

⁹⁰ Harold Nicolson (1886–1968) nûser, dîplomat û siyasetmedarêkî nawdarî brîtanîye. Xawenî çendîn berhemî hemerenge, yek lewan kitêbî: *Diplomacy* (1939) -ye.

⁹¹ Berdaşt: kartêkirdin, *impression*.

⁹² Em nûsîne beşêke le kitêbêkî swêdî ke koberhemî çendîn dîplomate.

Paş rastgoşî, Nicolson “Wirdekarî” dekate xesletêkî girîngî dîplomatî baş:

Lêreda mebest tenha dirustayî hizirî nîye, belkû wêray eweş dirustayî akare. Kesî beşdar le giftûgoda debêt le herdû buwarî, hem bîr û hem hestda wirdekar bêt.

Min salî 1964 le London pendêkim lem wirdekarîye wergirt. Yekem carim bû raportêkî nûsiraw amade bikem bo Gunnar Hägglöf -î serkarim. Ew zemanê hemû raportêkî çûba bo wezaretî henderan deba le layen serokî bingewe wajû kiraba, ca her kesêk nûsbay. Nawî nûser hergîz le raportekeda nedehat - maweyek paş ew deme ewca nawî nûser le goşey serewey laçep, le jêr serdêrî “berpîrsî babet” -da denûsira.

Gunnar Hägglöf raportekey minî le pêş xo dana, seyrêkî serdêrekey kird û pîrsî: “Dey, em nûsirawe çî têdaye?” Min pêm weha nebû dawam lê bikirêt zarekî nêwerokî raporteke rûn bikemewe, leber ewe amade nebûm. Wêray eweş beşêkî zorî raportekey rûnûsînewey gutargelî nêw rageyandinî brîtanî bû. Boye şirove zarekîyekey min lêl û narêk derçû. Hägglöf be aramî raportekey gerandewe û gutî: “Leweye weha baş bêt carêkî dîke be raportekeda biçîtewe pêş ewey rewaney bikeyn”.

Şermezarane geramewe jûrekey xom û serleberî raportekey dariştewe - ewca bewey têkstekem be şîrazeyekî lojîkane û be derbirînî xom nûsyewe, aşinay nêwerokî basekeş bûm. Ke emcare nûsînekem birdewe bo balyoz, bê ewe tenanet temaşay têksteke bikat, wajûy kird. Paş ew pende le “Wirdekarî” nûsînekanim bûne cêbawerî balyoz û zorbeyanî bê xwêndinewe wajû dekirî. Hägglöf tenha ew raportaney dexwêndewe ke lay xoy serincrakêş bûn.

Stockholm dey zanî gişt raportêkî asayî le London -ewe bêt berhemî karmendî bînewî balyozxanekeye, çunke Hägglöf namekanî xoy le şewey “raspardey taybet” (Dispatch) -da denard, wate nihênî bûn û rastewxo arastey wezirî henderan dekiran nek wezaretî henderan.

Nicolson denûsêt:

Gerçî dîplomatî pişewer be degmen nebêt xoy tûşî nawirdîy hizirîy nakat, belam berdewam pestanî behêzî lesere rûwew xizîn berew nawirdîy akarekî. Em nawirdîye le akarada corî zore. Dîplomatî azimûde zor çak dezanêt ke reftarî mirovane gîrodey rûdawî şepirêwaneye û pêşbînîkirdin hemîşe karêkî tirsînake. Leber eweye dîplomat hemîşe meylî heye bo xo ladan le gişt core pêşbînîkirdin û falgirtineweyek şewazî hemezani pêwe bêt.

Dîplomat le rêy “wirayî” yewe xoy deparêzêt le xobestînewe. Belam fermangey welat, bo ewey xoy amade bikat bo pêşhatekanî ayende, çawerêye wêneyekî hebêt derbarey dahatûy barûdox. Ger balyoz newêrêt nerme pêşbînîyekîş derbarey ayende bidat, raportekey be asanî debête mayey nakamî. Bo kemêk xo ladan lem bare dekirêt dîplomat ragiwaste le boçûnî kesanî dîkey nawdar bînewewe derbarey rûdawî ayende û ewca pena berête ber xoparêzîy dîplomasyaney delêt: “le layekewe ... û le layekî dîkewe ...”.

“Aramî” xesletêkî dîkeye bo dîplomatî baş. Nicolson denûsêt:

Erkî karmend her ewe nîye hewil bidat tûrebûnî xoy bişarêtewe katêk rûberûy gewcêtî, dûrûyî, dirî û pûçî debêtewe lay ew kesaney naçare giftûgoyan le tekda bikat, bigire leweş bitirazêt, debêt xoy reha bikat le gişt core newîstinêkî kesekî, le hemû evînêkî

pêşkatî kesekî, le pêşdawerî, dilgerimî. Pûçelayetî, zorroyî, zêdepêwenan û ziyani akarekî.

Nicolson delêt: aramî, debêt be rûxoşî, yan her nebêt be cilewgirtinî rûgirîy xot, pêşan bideyt. Amajeş dekat be sengî “*xoragirî*”. Sebir û xoragirî lew xesletanen ke nûseranî em kitêbe xoşxoş cexityan lê kirdûn.

Xesletî aramî û xoragirîy, dîwêkî heye lawekî, mirov be xemsard û bêbak pêşan dedat. Balyoz lem rwangeyewe lay hawkar û xelkî derekîş birewî namênêt, be giwêneder û gemijel, bêmêşik û rwaletperist dadenrêt.

Barûdox heye taybetin û pêşandanî hest têtayanda karîgerî heye Leser gorînî ew doxe. Bîstûme goya paş hejendî *Sûnamî*, balyozî swêdî le telefonda bo wezaretî henderan, bedem baskirdinî hemû ew wêrankarî û kuştarey bînîbûy le kenar zerya le Tayland, dabûye pîrmey giryan. Bew giryane, ewca wezaretî henderan û encûmenî wezîran têtgeyîştin çi hejendêkî sirûştîy tirsinak rûy dawê.

Gunnar Hägglöf mawey bîst sal le London xerîkî ew xeseletî xoragirî û hestsardîye bû ke lay înglîz pîrbayexe. Lewe nedeçû hîç basêkî le la seyr bêt, hîç layenêkî mirovkarane be layewe namo bêt. Belam ew cilewgîrîye zor car xende yan geşenîgayekî bedemewe debû. Gelêk car le pişt ew xoğîrîyewe core şerimêk heye lew hestaney serhel deden û mirov nayewêt pêşanyan bidat. Hawkaranî Hägglöf fêrbûbûn çon zimanî cestey serok: rabûnêkî biro yan dest raweşandinêk be biyanûy malînî toz le rûy mêtzeke, lêk bidenewe.

“*Hêminrewtî*” û “*Hêmingoyî*” xesletî girîngin le dîplomasîda. Bem xesletane mirov peroşîyekî serincîrane pêşan dedat hem bo layenî beranber û hem bo barûdoxî beranber. Ger babay balyoz bîhewêt be zanîni xoyewe binazêt, her zû deçête xaney “*xo bezana zan*” -î herasanbexş. Hawkarêkim ke serdemanî *eparthayd (helawêrdinî regezî)* balyoz bû le başûrî Afirîqa seredanî serok fermangeyekî swêdî degêrêtewe ke demî firavîn le balyozxane, be amadebûnî çendîn siyasetmedarî nawdarî berhelistkar, kewte rûnkirdinewey barûdoxî siyasîy başûrî Afirîqa. Em babaye hîç pirsyarî nekird, axir bo xoy hemû şitêkî dezanî. Keşî ew firavîne damirka û ne tenha axêwer belkû karmendanî balyozxaneş şermende man.

Xopesendî debête mayey kizbûnewey twanay xoguncandin, dabezîni “*twanay pey birdin*”. Ewey be piley yekem naşîrîne le xopesendîda, bekemzanîni beranbere.

Behreyekî dîke lay dîplomatî baş birîtiye le “*hogirî*”. Derbarey emyan Nicolson denûsêt:

Dîplomatî pişewer bertawî hogirîy ciyawaz û carî wa heye dij beyeke. Dîplomat debêt hogir bêt beranber salarî xoy, hikûmetekey xoy, wezîrî henderan û wezaretî henderan. Ewca beranber kesani fermanberî xoy, beranber korî ew dîplomatgeley lew pêtexte karî letek deken, beranber ew rewende hawzêdey xoy ke lew şareda hen û beranber berjewendîy abûrîy wan. Le dûwa pîleda dîplomat beranber ew hikûmetey le tekiyanda xawen raspardeye û beranber ew wezîrey giftûgoy legelda dekat, corêkî dîke hogirîy le estoye.

Kesanî dîplomat zû zû cêgorkêyan pê dekirêt, hokarîş eweye dîplomat ger bo maweyekî dirêjxayen jîyan le welatî wêstge beser berêt, dûr niye pitir hawsozîy emyan bêt nek welatî xoy - rîskîş ziyad debêt hogirîy zêdî xoy xamoş bêtewe û hogirîy welatî wêstge geşe bikat. Em diyardeyeş reng dedatewe hem le raport û hem lew biryananey dedirêt ke pitir layengirî welatî biyanîn nek welatî xo.

Balyoz le pêgey xoyda xoy pê hênde şarezay siyasete ke be reway dezanêt le rwangeyekî geşewe hokare bineretekanî ew helwêstey xoy rûn bikatewe ke weha pêdeçêt le Swêd pesend nebin.

Carîş heye balyoz be şaerkî xoy dezanêt ke baştirîn peywendî letek deselatdaranî hikûmetî ew dewleteda saz bikat ke lêy niştêcêye û bo ew mebestêş hemû karêk dekat bo dilasûdeyî ewan gerçî be ziyânî welatekey xoyîşî bişkêtewe. Ger ew hawsozîye bo welatî wêstge ziyaderoyî têda bikirêt bê ewey sinûrî prinsîp û nixandinî swêdî reçaw bigirêt, ewsa deselatdiranî welatî wêstge her zû derik bew diyardeye deken û beweş mitmaneyan be babay balyoz leng debêt. Mirov rêz lew jin û piyawane degirêt ke dakokî le siyasetî welatî xoyan deken, gerçî dîdêkî dîkeşyan hebêt le siyasetda.

Car heye bareke pêçewane debêtewe, balyoz le pêgey zor taybetda peywendîy weha pitew legel deselatdaranî ew welateda saz dekat, hikûmetî xomalî, bo sûd wergirtin le pêgey ew kesane, deyan hêlêtewe le cêy xoyan. Yek lewan Gunnar Hägglöf e ke hênde rêzdar bû le London, hikûmetî Swêd bo mawey bîst sal le pêgey xoyda hêştîyewe. Ewca wek “Dean” - kesêkî xawen ziyadtirîn xizmet wek balyoz - Hägglöf pileyekî protokolaney berzî pê dira û kiraye niwêner û gutebêjî korî dîplomatan.

Paş sirbûnî pêwendîy nêwan Stockholm û Waşîngton, be hoy cengî Vîyetnam -ewe, hikûmetî swêdî be mebestî xawkirdinewe û xoşkirdinewey peywendîy legel Amerîka -da, Wilhelm Wachtmeister⁹³ kirde balyoz le Waşîngton. Emîş karekey weha encam da geyîşte ewey berdewam gemey tênsî hebêt letek serok Bush -î babda. Helbet em peywendîye le Waşîngton pêgeyekî rêzdaraney pê bexşî û hikûmetî Swêd -îş pêy xoş bû sûd lem bare wergirêt û leber ewe mawey xizmetekî lewê dirêj kirayewe bo pazde sal û beweş Wachtmeister bûwe balyozî xawen zortirîn xizmet lew balyozxaneyeda.

Ray giştî le siyasetî cîhanîda heta dê pitir seng peyda dekat, boye dîplomatî em serdeme debêt “pêdagog”⁹⁴ êkî baş bêt bo ewey bitwanêt rûdaw şirove bikat û be rûnkirdinewey guncaw dakokî le çareserekan bikat.

Zeman deçerxêt belam beha bineretîyekanî dîplomasî cêgîrin. Harold Nicolson nûsyarekey xoy derbarey dîplomatî bêgerd bem wişane ko dekatewe: “Lewaneye xwêner berperçim bidatewe û bilêt, belam êwe lebîrtan çû bas le zîrekî, zanyar, jîrî, mîwaninewazî, mîhrebânî, gurgî û azayetî biken”. Nicolson berdewam debêt û delêt “Nexêr, emanem leyad nekirdûn, emanem be asayî û gumanbeder danawin”.

Sêr Harold, rê bifermû bilêm, ezimûn pêşanî dawê ke ew taybetmendîyane asayî û gumanbeder nîn. Boye lem kitêbeda beser dekirênewe.

«...»

⁹³ Dîplomatî swêdî Wilhelm Wachtmeister (1923–2012) le nêwan 1974-89 da balyozî Swêd bû le Waşîngton.

⁹⁴ Pêdagog: *Pedagogue*, fêrkar, amojyar, barhêner û rahêner.